Guhdar bike 'mêrê biçûk'

Piştî êrîşa nijadperest a li bajarê Almanya Hanau yê piraniyên wan kurd deh kesan jiyana xwe ji dest da. Êrîşên nijadperest ên bi taybetî li Almanyayê û bi giştî li Ewropayê ku roj bi roj zêde dibin, ne mijareke nû ye... *Munewer Azîzoglu Bazan / RÛPEL - 2*

Dibistana bilind

Têkiliya dayika me ya bi me re, têkiliya me ya bi me re diyar dike. Têkiliya me ya bi me re, têkiliya me ya bi derdorê re kifş dike. Em bi dayika xwe re têkiliyeke çawa saz bikin, têkiliya me bi wê re sazkirî, berê jiyana me diyar dike... *Reyhan Îke / RÛPEL - 5*

Salnameya gel

Kurdên gundan, li gor şert û mercên hewayê û li gor tecrûbeyên bav û kalên xwe, ji xwe re salnameyek çêkirine. Wek 'Xaç Xidir Nebî', 'Zîpedar', 'Agirê Filan', 'Sibatê du roj ji adarê deyn kir, gîsk li tehtê wer kir', 'Gamêşqiran'... *Yasemîn Elban / RÛPEL - 8*

Rojnameya Heftane

xwebûn

24 Sibat - 1 Adar 2020
Hejmar: 10
Buha: 4 TL

www.xwebun.org

rojname@xwebun.org

Ev zimanê 50 milyon kesan e

Rêxistina Perwerde, Zanîn û Çandê (UNESCO) ya Neteweyên Yekbûyî, di sala 1999'an de, ji bo bîranîna xwendekarên zanîngehê yên bangladeşî, 21'ê sibatê weke Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî ragihand. Bi boneya girîngî û wateya vê rojê gelek sazî û rêxistinên kurdan daxuyanî dan û çalakî lidarxistin. KNK'ê bang li hemû kesan kir ku bi kurdî biaxivin û li kurdî xwedî derkevin. PEN'a Kurd got ku zimanê kurdî zimanê neteweyekê ye ku nêzî 50 milyonî ye û wek welatê wan zimanê wan jî di bin êrîşê de ye. Tora Ziman û Çanda Kurdî û Platforma Zimanê Kurdî xwestin kurdî bibe zimanê fermî... *RÛPEL - 3*

Kurdên li utopyayê

Thomas More di pirtûka xwe de behsa kurdan dike ku utopyaya senteza tevî utopyayan e! Yanî li vî welatê xewn û xeyalan, li vî welatê utopyayê yê pak û ronak kurd jî hene! Her wiha behsa gelekî dike dibêje "li çiyayan dijîn, bi zimanekî nêzî farisî diaxivin, tenê bacê didin farisan, cil û bergên wan, her tiştên wan xwerû ne" Ev ne kurd bin, kî ne? Niha Rojava jî Utopyaya herî mezin e, loma ewqas rastî êrîşan tê... *Mizgîn Ronak /R.2*

Kurdî qedera min e

Gava di şahî û konserên kurdan de bi kurdî distirê, mirov dibêje qey ew bi eslê xwe kurd e. Wexta mirov guhdariya dengê wê dike, ew deng mirovî bi xwe re dibe çiya û zozanên Kurdistanê yên berz û bilind. Hunermend Elêonore Fourniau pirsên me bersivandin û got, "Kurdî qedera min e, ez qedera xwe dijîm."... *Hevpeyvîna Încîl Selçûk / RÛPEL - 4*

Bêkarî û derûniya civakê

Her roj li derekê xwekuştinek pêk tê. Emile Durkheim û Wagner sax bibin, ew ê Tirkiyeyê wek laboratuareke civakî ji xwe re bi kar bînin. Xelk birçî ye, bêkar bi milyonan in, her roj nûçeyên der barê xwekuştinê de hene û rayedar bûne demogogên ku ruhê McCarthy vedijînin û li ser ekranan manîpulasyon û demogojiyê dikin. Hiqûmet jî bûye hikûmeta aşê dînan. Bê av digere... *Ramazan Tûnç / R.6*

Hêzeke hevpar hewce ye

Li gel geşedanên giştî yên siyasî, kurdistanî niha li ser yekitiyê disekînin. Li çar parçeyên Kurdistanê û Ewropayê kurdan nîqaşên xwe yên derbarê yekitiyê de berfireh kirin. Nîqaşên ku di demên dawiyê de hatin kirin encamên girîng derxistin holê. Hat gotin ku divê kurd hêzeke leşkerî ya hevpar ava bikin... *RÛPEL - 6*

Karapêtê Xaço û Yêvaya Hagop

Karapêtê Xaço wiha digot: "Xwezî min mirina Yêvayê nedîta, xwezî nebûma şahidê mirina wê. Xwezî Xwedê pêşî canê min bistanda. Wê jî zehf kişand. Êşên wê, di xetên rûyê wê de xuya dibûn."... *Salihê Kevirbirî /RÛPEL - 11*

Rituelê rojeyê Xizirî dewam keno

Aşma Xizirî bi girewtişê rojeyan û rituelanê bawerîye dewam kena. Aşma Xizirî (raştê aşma sibate yena) ke semedê elewîyan sey bimbarek yena qebûlkerdene de cem yeno girewtiş û loqme yeno vilakerdiş. Yê diyîne zî no yo; Goreyê yewna bawerîye wexto ke tofan hêzê xo xurt keno û bahoz vejîyeno, kesê ke weniştî keştîye hawarî kenî û vanî 'Ya Xizir, ti ma bixelisnî' û duayan kenî... *RÛPEL - 9*

Samî Tan
Ziman û şêwaza dilsojên kurdî
Rûpel - 5

Cemîl Oguz
Rojava û Başûr butçeyke senîne virayte?
Rûpel - 9

Şener Ozmen
Jûra xebatê
Rûpel - 11

Agît Yazar
Ji Hz. Nûh heta Mehmet Tûnç; Cizîr
Rûpel - 12

Jina pêşeng a dema xwe; Hypatia

‘Dema mêrek xweşikiya laşê jinan dibîne divê bi şehwet nekeve dû lêgerîna fetihkirina wê. Şûna vê, divê fêm bike ku xweşikbûna wê, rûyê xweşikiya rasteqîn e.’

Navenda Nûçeyan

P.Z di sedsala 4’emîn de bajarê Îskenderiyeyê heybeta xwe ya berê winda kiribû. Dewlemendiya bajar bi rêveberiya Romayê re kêm bûbû; bajar ji ber pevçûnên sivîl û olî xira bûbû. Piraniya pirtûkxaneya bajar şewitîbû. Muze ketibû rewşeke bêîstîkrar û endamê wê yê dawîn jî filozof û matematîkvan Theon bû. Navdariya Theon herî zêde ji ber ku bavê jineke xweşik û jîr bû dihat. Navê vê jina xweşik û jîr Hypatia ye.

Tê payîn ku Hypatia P.Z derdora sala 370’an hatiye dinê. Theon keça xwe li ser esasê ‘*Mafê xwe yê fikirînê biparêzin, fikra şaş ji qet nefikirînê çêtir e’* perwerde dike, hemû mantiqa matematîk, astronomî û felsefeyê fêrî Hypatiyayê dike. Di heman demê de Hypatiya di muzeya ku hemû berhemên filozof û felsefevanan lê ne de alîkariyê dide bavê xwe, metnên dîrokî sererast dike û li ser hin xebatên felsefî nivîsan dinivîsîne.

Nivîsên rexneyî dinivîsîne

Di nav demeke kurt de Hypatia xebatên geometrîvanê mezin Pergeli Apollonuisus jî di nav de li ser xebatên Diyofantus ê Arîtmetîkayê nivîsên rexneyî dinivîsîne. Lê piştî demekê ji nivîsên rexneyan tetmîn nabe û dest bi xebatên xwe dike. Ji bo cihê roj û stêrkan hesab bike usturlapeke nû çêdike û gelek alavên ku di xebatên fizîk, kîmya û astronomiyê de dibin alîkar bi pêş dixe.

Hypatia derdora salên 400’î piştî bavê xwe berpirsyariya dibistanan neoplatonîst a felsefeyê digire ser milê xwe. Xwendekarên wê li dû fikrên wê diçin û piştî demekê jîrbûna Hypatiayê belavî her derê dibe û malbatên dewlemend ên împaratoriya Romayê jî zarokên xwe dişînin ba wê. Hypatia tevî ku xwedî baweriyeke pagan e jî, gelek hurmet nîşanî baweriya xiristiyanî û cihûtiyê dide. Lê mixabin tu nivîsên wê heta roja me ya îro nehatine û nivîsên ku têkildarî wê hene jî nivîsên xwendekarên wê ne.

Gel perwerde dikir

Hypatia ji jinên Îskenderiyeyê (yên ku bi tu awayî tev li jiyanê nedibûn) cudatir li navenda bajar gel perwerde dikir û li ser matematîk, astronomî, dîrok ango li ser felsefeya Platon û Aristotelesî diaxivî. Gel ji zanebûna wê bi bandor dibû.

Li aliyê din Hypatia der barê cewhera xweşikbûnê de xwendekarên xwe perwerde dikir û têkildarî cewhera xweşikbûnê wiha digot: *“Dema mêrek xweşikiya laşê jinan dibîne divê bi şehwet nekeve dû lêgerîna fetihkirina wê. Ji dêvla vê divê fêm bike ku xweşikiya wê, sûretê xweşikbûna rasteqîn e. Mirov, dema carekî bikeve nav xwezaya xwe ya heywanî, wê demê nikare li ser cewhera xweşikbûnê bifikire, mehkumê jiyana di nav korîtiya xwe û derewên Hades de dibe.”*

Lê piştî axaftina Hypatiayê xwendekarekî wê diçe gel wê û hezkirina xwe jê re tîne ziman. Li ser vê yekê Hypatia gotinên ku gotiye ji bo baş bê fêmkirin, ji nav tûrikê xwe paçeke ku wê demê jinan di dema reglê de bi kar dianîn, derdixe û wiha dibêje; “Tişta ku tu jê hez dikî ev e. Tu ji xweşikbûna rasteqîn hez nakî.”

Fikrên wê bi nirx dibûn

Her ku navê Hypatiayê belav dibûn, fikrên wê ji aliyê pêşengên bajar ve bi nirx dihatin dîtin. Heta waliyê împaratoriya Romayê yê bajarê Îskenderiyeyê Orestes jî ew dawetî konseyê dike û bi demê re dibin hevalên herî baş.

Lê Îskenderiye û Hypatia di destpêka sedsala 5’emîn de, di navbera rêveberê şerê otorîteya sivîl a Orestes û piskoposê xiristiyan Cyrail de dimînin. Her diçû aloziya di nav gel de mezin dibû, li dijî paganan împaratoriya Romayê dest bi qirkirinê kiribû û her ku ola xiristiyanî belav dibû li ser baweriyên cuda zext zêde dibûn.

Li hemberî wehşata ku her diçû zêde dibû, Hypatiayê ji bo rawestina vê yekê piştgirî dida Orestes. Lê piskoposê xiristiyanan Cyril ji bo bandora Hypatiayê di nav civakê de tune bike, dest bi propagandayên reş dike û gotegotên wek Hypatia pîrebok e û sêhrên xirab dike, belav dike. Ev gotegot di nav xiristiyanan de dibe sedema hêrsê. P.Z di sala 415’an de xiristiyan êrîşî mala Hypatiayê dikin, kincên wê yê filozofiyê jêdikin û di kolanan de bi erdê ve kaşdikin. Piştre li dêra xiristiyanan bi keviran ew qetil dikin.

Heta ev girseya hov ku qetilkirina jineke filozof têr nabîne, bedana wê parçe dikin û di nav agirê şahiyê de dişewitînin. Piştî qetilkirina Hypatiayê dêra xiristiyanan ji bo nixumandina vê hovîtiyê hemû berhemên Hypatiayê tune dikin. Ji ber vê yekê di roja me ya îro de tu nivîs û berhemên wê tune ne.

Dijminatiya li dijî jinan

Kîn û hovîtiya li dijî Hypatiayê ne ji ber filozîfiya wê yan jî baweriya wê dihat, hovîtiya li dijî Hypatiayê herî zêde ji ber jinbûna wê bû. Ji bo tunekirina îrade, zanebûn û pêşengiya jinan û ji bo tirsandina jinên ku li ser şopa wê dimeşîn, hovîtiyeke bi vî rengî lê hat kirin. Heta ji bo navê wê li dîrokê neyê nivîsandin û bê jibîrkirin hemû nivîsên wê hatin tunekirin. Lê dîsa jî desthilatdariya mêr nedikarî rastiya jinan tune bike.

Çawa Hypatia di serdema xwe de bi zanebûna xwe li dijî ferasetên mêran ên jin biçûk didîtin sekinî, roja me ya îro jî li her derê cîhanê jin bi heman mîrasê li ber xwe didin û heqîqeta xwe derdixin holê.

Kurdên li utopyayê

Mizgîn Ronak

Demek berê çapemeniya me jî ‘nûçeya’ yek ji rojnameya mezin û navdar a ewropî wekî ‘nûçe’ da û got “Kurd yekane gelê mezin ê bêdewlet e ku hatiye parçekirin.” Digel bertekan jî ez aciz bûm; ma ew jî nûçe bû! Ma tiştên wiha jî êdî nûçe ne? “Kurd bêdewlet in, qehreman in lê parçekirî û parçebûyî ne” yanî çi? Qey nû tê keşifkirin, xêr e ku timî eynî tişt wiha tê dubarekirin?

Ger ji bo xelqê (Ewropa) nû û nûçe be jî ji bo me ne wiha ye. Yan jî dema ku em didin jî lazim e em digel rexne yan jî kevintiya vê ‘tesbîtê’ bidin. Lewra em birçiyên qalkirinê ne. Bila hema hinek qala me bikin, me bikin nûçe çi dibe bila bibe? An jî em wiha bêjin li gorî neolîberalîzmê “reklama baş û nebaş tune ye, reklam reklam e!” Na heyra. Pêdiviya me bi reklaman jî nîn e. Lê dixwazim tiştekî ku pir dereng pê hesiyam (belkî bo we jî wisa be) binivîsim.

Thomas More (07.02.1478-1535) di pirtûka xwe ya navdar û dîrokî, utopyaya ku senteza tevî utopyayan e, behsa kurdan dike! Yanî li vî welatê xewn û xeyalan, li vî welatê utopyayê yê pak û ronak, kurd jî hene! Her wiha behsa gelekî jî dike dibêje “li çiyayan dijîn, bi zimanekî nêzî farisî diaxivin, tenê bacê didin farisan, cil û bergên wan, her tiştên wan xwerû ne” ev ne kurd bin, kî ne?

Mînak Barzanesên ku di zimanê nû de ji wan re Ademos dibêjin ango serokdewlet jî ji hêla çîna wan zanyaran ve tê hilbijartin!” “Bena, benza, berzan” hemî kurdî ne û wateya wan ‘bilind’ e. Her wiha herêma Barzan a li Başûr jî tê zanîn. Lê ev yek li xweşa wergêr neçûye û geh gotiye azerî ne, geh jî gotiye ermen in, lê em dizanin ku rastiya erdnîgarî, peyvsazî û domdarî delîlên herî mezin in.

Mînaka din jî ev e: “Ecêb e lê utopyayî bi dînan kêfxweş dibûn û ew jî kêfxweş dikirin. Ên ku bi dînan kêfxweşî dikirin na, lê yên ku ew (dîn) biçûk didîtin dihatin şermezarkirin.” Ji we re jî nas hat? Lewra kurd bi awayek, zanistî û dildarî nêzî ‘dînên xwe’ dibin (an jî dibûn) û wekî civakên kapîtalîst wan naşînin şêtxaneyan.

Hêvî dikim ku bîranînên her kesên rûgeş bi dînan re hebin. Dînên ku dikenin, dibêjin û şa dibin. An jî aqilmend û dînên ku di yekitiya civatê de gihîştine hev û ne serdestiyê, dilxweşiyê li hev parve dikin. Di zaroktiya min de dîneke navdar hebû. Navê wê Neîme bû, wekî ziyaretekê zindî bû. Hem madî hem manewî parçeyek ji hebûna derdora xwe bû.

Îcar ku em vegerin ser zaroktiya mînakan: Dê hin kes bêjin kurd li ku, utopyaya navdar li ku? Lewra kurdan layiqê cihên wiha nabînin lê waye nivîskarê dilovan dîtiye û nivîsandiye. Vê yekê, wek kurdekê ez kêfxweş kirim lê ji bo ku ewqas bi sansur û ji hêla kurdan ve bêkeşif maye jî li ber ketim. Li aliyê din, niha Rojava jî Utopyaya herî mezin e, loma ewqas rastî êrîşan tê. Utopya; ji yewnanî tê, Topos “cih” e,“u” daçeka neyîniyê ye “îa” jî nîşana erdnîgariyê ye yanî welatê cihê ku nîn e lê di wateya yewnanî de eutopîa dihat wateya ‘cihê xweş û bextewar”.

Biyan

Munewer Azîzoglu Bazan

Guhdar bike ‘mêrê biçûk’

Piştî êrîşa nijadperest a li bajarê Almanya Hanauyê piraniyên wan kurd deh kesan jiyana xwe ji dest da. Êrîşên nijadperest ên bi taybetî li Almanyayê û bi giştî li Ewropayê ku roj bi roj zêde dibin, ne mijareke nû ye. Gotina ‘em ne di ewlehiyê de ne’ êdî ji zû de ye bûye peyveke gerdûnî. Her çiqas di rewşa heyî de çalakiya kujerê Hanauyê bi tu awayî wek êrîşeke takekes neyê dîtin û wek encama polîtîkayên krîmînalîzekirina penaberan, gotinên nifirîn ên tevger û partiyên rastgir ên nijadperest, gotin û praxîsên rasîst ên saziyan, ango wek êrîşeke bi rêk û pêk bê dîtin jî, hewce ye mirov li ser kujerî, li ser ‘mêrê biçûk’ bisekine.

Bîrdoziya nijadperest di serî de xîtabî ‘mêrê piçûk’ dike (Bora, 2000). Hêrsa wî ya kor tûj dike, jê re dijminan diafirîne, wî di nav stembariya wî de bilind dike. Bi vî awayî ‘mêrê biçûk’ ê ku biqasî serê derziyê bi kêrî tiştekî nayê, xwe girîng, mezin û cûda dibîne. Kompleksên xwe û tirsên xwe bi sûcdarkirinê piştperde dike. Tundiyê wek amûreke bingehîn bi kar tîne û wek ‘çalakiyeke mêrane’ lê xwedî derdikeve. Ji mêraniya xwe û xwerûbûna xwe razî ye.

Nijadperestî xwedî zayend e û ev zayend bêguman mêr e. Li gorî berjewendiyên hemzayendên xwe -dewletê, baviksalariyê û kapîtalîzmê- tevdigere. Lewma jî ligel dijminatiya yên ne wek wî, dijminatiya jinan jî dike. Di dîroka rejîmên faşîst de li gorî hişmendiya nijadperest rola jinan bi dayiktî, nanpêjî û xwedîkirina zarokan hatiye sînorkirin. Jin tenê di çarçoveya avakirin û domkirina ‘neteweya pîroz’ de xwedî nasname bûn. Ev helwest di zihniyeta netewe-dewletî de hîn jî berdewam dike. Ev sekna netewe-dewletî di heman demê de nêrîna sazumankirî ya gerdûnî ya li dijî jinê ye.

Li gorî vê mantiqê ji bo ‘mêrê biçûk’ jî jin dijmin e. Heta jinan wek berpirsiyarên rewşa xwe ya xerab dibîne. Di çalakiyên nijadperest ên ku ji hêla ‘mêrên biçûk’ ve -an wek takekes an jî rêxistinî- pêk hatine de motivasyona dijminatiya jinan gelek aşkera ye. Bi taybetî di êrîşên salên dawî yên li Ewropayê de kujerên nijadperest di vîdeo yan jî di nivîsên xwe yên ku diweşînin de ligel antîsemîtîzmê û penaberan yekser êrîşî femînîzmê jî dikin: “Jin êdî zarokan çênakin an jî zarokên wan ne xwînxwerû ne. Ji ber kêmhejmariya zarokan pêşeroja neteweyê di xeterê de ye. Lewma ye jî penaber tên vê derê. Hemî ban û saziyên me dikevin destên wan. Û berpirsiyara vê yekê jî femînîzm e.” Femînîzm an jî bi giştî têkoşîna jinan di vê astê de tirsa ‘mêrê biçûk’ bi awayekî tazî derdixe holê. Bêguman ne bi argumanên ku nijadperest diafirînin, lê di rewşa xerab a ‘mêrê biçûk’ de rola femînîzmê û tekoşîna jinan gelek mezin e. Ji ber vê yekê ye ku ji Rojava bigire ku çeteyên ‘mêrên piçûk’ ên DAIŞ’ê bi kuştina ji destê jinan û ji dojehê ditirsiyan, heta ‘mêrê biçûk’ Breivik ê ku li Osloyê 77 kes kuştin û di êrîşa xwe de bi taybetî jinên ciwan hedef girt, nijadperest nefreta xwe ya li dijî jinan bi her awayî vedireşin.

Bi kîjan motîfî dibe bila bibe yan jî ji kîjan hêlî tê bila bê, hişmendiyên nijadperest di bingeha zayendperestî û dijminahiya jinan de digihijîn hev. Li dijî vê hişmendiyê azadiya jinan wek temînata azadiya civakê dîtin û li ser vî esasî piştgirî avakirin dojeha ‘mêrê biçûk’ e.

Kurd li benda fermîbûna zimanê xwe ne

Sazî û dezgehên kurdan ji bo 21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî gelek daxuyanî dan û çalakî li dar xistin. Kurdan xwest ku astengiyên li pêşiya zimanê wan bên rakirin û zimanê kurdî bibe zimanê fermî

Navenda Nûçeyan

Ji sala 1999'an ve her sal 21'ê Sibatê li seranserê cîhanê weke Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî tê pîrozkirin. Di sala 1952'an de komeke xwendekarên zanîngehê yên bangladeşî ji bo ku zimanê wan bibe zimanê fermî yê Pakistanê çalakî li dar xistin. Lê ev daxwaza rewa ya xwendekaran ji aliyê Pakistanê ve bi tundî hat bersivandin û gelek xwendekar hatin kuştin.

Rêxistina Perwerde, Zanîn û Çandê (UNESCO) ya Neteweyên Yekbûyî (NY), di sala 1999'an de, Ji bo bîranîna xwendekarên zanîngehê yên bangladeşî, 21'ê Sibatê weke Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî ragihand. Bi vê ragihandinê UNESCO'yê armanc kir ku bal bikişîne ser girîngiya zimanê dayikê. Bi heman armancê, her sal di vê rojê de li welatên cuda pîrozbahî tên lidarxistin û gelek bernameyên akadamîk û panel tên organîzekirin.

Ceza li kurdî birîn

Lê li Tirkiye û bakurê Kurdistanê rewş berovajiyê cîhanê ye. Ji hêla dewletê ve ji bo zimanê tirkî bernameyên pîrozbahiyan tên lidarxistin û pesnê zimanê tirkî tê kirin. Li gel vê rewşa zimanê tirkî, zimanê kurdî jî li saziyên dewletê qedexe ye. Her liv û tevgera ji bo kurdî ji hêla dewletê ve tê astengkirin û cezakirin. Ji hêla fermiyetê ve bi tu awayî zimanê kurdî nayê naskirin. Ji ber vê yekê kurd vê rojê li şûna pîrozkirinê, bi bername û çalakiyan pêşwazî dikin.

Di vê pêvajoya ku Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî hat pêşwazîkirin de, ji ber xebatên wan ên kurdî ceza li 90 kesî hat birîn. Di sala 2015'an de li Îzmîrê komekê ji bo daxwaza perwerdeya zimanê zikmakî çalakî li dar xistibû û hatibûn binçavkirin. 18'ê sibatê danişîna van kesan hat dîtin û ji ber vê daxwaza wan 5 meh ceza li wan hat birîn.

Çalakî li dar xistin

Li gel van astengî û zehmetiyên ku ji hêla dewletê ve ji kurdan re tên derxistin jî kurd xebatên xwe yên ji bo kurdî didomînin. Ji bo Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî bi peşengiya Tora Ziman û Çanda Kurdî û Platforma Zimanê Kurdî di nav hefteyê de daxuyanî hatin dayîn û çalakî hatin lidaristin. Ev daxuyanî û çalakiyan li bajarên mîna Amed, Mêrdîn, Wan, Şirnex, Agirî, Erzirom, Îdir, Meletî, Dersim, Çewlik, Êlih, Dîlok, Edene, Mêrsîn, Hatay, Aydin, Stenbol û Îzmîrê pêk hatin.

Di çalakiyan de qala pirsgirêkên kurdan ên ji ber ziman hatin kirin. Dîsa zext û pêkûtî û astengî û qedexeyên dewletê yên li ser zimanê kurdî hatin bibîrxistin û ji dewletê hat xwestin ku astengiyên li pêşiya kurdî bên rakirin û zimanê kurdî bibe zimanê fermî.

Meclisê di 21'ê sibatê de jî ziman red kirin

Parlamenterên Partiya Demokratîk a Gelan (HDP), ji bo balê bikişînin ser 21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî, pêşnûmapirs û pêşniyarpirs dan meclisê. Bi giştî 22 parlamenteran bi zimanê kurdî (Kirmanckî-Kurmancî), tirkî, erebî û suryanî, pêşnûmapirs û pêşniyarpirs dan serokatiya meclisê.

Parlamenteran di pêşnûmapirs û pêşniyarpirsên xwe de bal kişand ser zextên li ser kurdî tên ferzkirin û daxwaz kirin ku di serî de bi zimanê kurdî bi zimanên din ên gelên Tirkiyeyê perwerde bê dayîn. Lê serokatiya meclisê bi hinceta ku pêşnûmapirs û pêniyarpirs ne bi tirkî ne hemû red kirin û li parlamenteran vegerandin.

Parlamenterên ku pêşnûmapirs û pêniyarpirs dan navê wan wiha ne: Alîcan Onlu, Ayşe Surucu, Dersîm Dag, Dîlan Dîrayet Taşdemîr, Ebrû Gunay, Erdal Aydemîr, Hasan Ozguneş, Hişyar Ozsoy, Huseyîn Kaçmaz, Îmam Taşçîer, Meral Daniş Beştaş, Mûazzez Orhan, Mûrat Sarisaç, Nûran Îmîr, Nûsrettin Maçîn, Omer Farûk Gergerlîoglû, Omer Ocalan, Pero Dundar, Remziye Tosûn, Şevîn Coşkûn, Tûma Çelîk û Tulay Hatîmogullari.

Kurdî mîrasa bêhempa ye

Kongreya Neteweyî ya Kurdistanê (KNK), Kongreya Civaka Demokratîk (KCD) û PEN'a Kurd bi boneya 21'ê Sibatê Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî daxuyaniyên nivîskî weşandin û 21'ê sibatê li hemû cîhanê pîroz kirin.

KNK'ê di daxuyaniya xwe de bal kişand ser girîngiya parastina zimanê kurdî û diyar kir ku mirovên zimanê xwe yê zikmakî wenda bikin dê her tiştê xwe bi hêsanî ji dest bidin. Di berdewamê de ji bo ku hesta neteweyî lawaz nebe KNK'ê bang li kurdan kir ku zimanê xwe yê dayikê û neteweyî bi hemû zaraveyên heyî ve biparêzîn û rojane di hemû waran de bi kar bînin.

KCD di daxuyaniya xwe de li ser girîngiya ziman û çanda kurdî rawestiya û KCD'ê diyar kir ku li dijî polîtîkayên bişaftinê divê li hemû qadên siyasî û civakî û tevahiya qadên jiyanê kurd bi kurdî biaxivin, bixwînin û binivîsînin. PEN a Kurd jî rêxistinbûyîna ji bo parastina zimanê kurdî bi bîr xist û diyar kir ku zimanê kurdî mîrasa herî bêhempa ye ku kurd ji zarokê xwe re bihêlin.

Ji kerba krîzê bi canê xwe ketin

Qedrî Esen

Li Tirkiyeyê demeke dirêj e, ji hêla desthilatê ve polîtîkayên antîdemokratîk tên meşandin û mafên mirovan tên binpêkirin. Ev pêkanînên li Tirkiyeyê bandoreke neyînî li jiyana mirovan dikin. Hatiye wê astê ku mirov nikarin bixebitin. Ji ber ku çalakiyên demokratîk jî li welat hatine qedexekirin, mirov nikarin dengê xwe li dijî vê rewşê derbixin û daxwazên xwe bînin ziman.

Dawî li jiyana xwe tînin

Welatiyên ku ji ber qedexeyên ji hêla desthilatê ve nikarin li dijî krîza siyasî û aborî derbikevin, serî li întîharê didin. Di nav hefteyê de li Tirkiye û bakurê Kurdistanê, nêzî 10 kesan ji ber krîza aborî û rewşa siyasî xwe kuştin.

Destpêkê, 16 sibatê li bajarê Konyayê ajokarê qamyonê M.Ç. ji ber pirsgirêkên aborî xwe kuşt. Di heman rojê de li navçeya Erdîşê ya Wanê jî welatiyê bi navê Geylanî Kamer, li mala xwe, xwe kuşt.

17'ê sibatê 3 kes

Rojek piştî van xwekuştinan, 17'ê sibatê li Şirnex, Amed û Stenbolê 3 kesên din xwe kuştin. Li navçeya Cizîrê ya Şirnexê welatiyê bi navê Nezîr Kiliç xwe ji avahiya qeymeqamiya Cizîrê avêt û mir.

Walîtiya Cizîrê têkildarî xwekuştina Kiliç daxuyanî da û angaşt kir ku Kiliç ji ber ku nexweş bûye xwe ji avahiya qeymeqamiyê avêtiye. Hevjîna Kiliç Kîbariye Kiliç got ku walîtî derewan dike û diyar kir ku hevjînê wê ji bo alîkariyê çûye qeymeqamiyê û ji ber ku rayedaran ew guhdar nekiriye xwe ji avahiyê avêtiye.

Li kolana Hunerê ya semta Ofîsê ya navçeya Yenîşehîrê ya Amedê jî çawişê pispor Kadîr Toskar bi çeka xwe, xwe kuşt. Xwendekarê Zanîngeha Stenbolê Hakan Taşdemîr jî li Stenbolê xwe kuşt.



18'ê sibatê 2 kes

Di 18'ê sibatê de jî xwekuştinan berdewam kir û 2 mirovan ji ber şertên welêt xwe kuştin. Li Stenbolê karkerê Şaredariya Zeytînburnûyê Yavûz Selîm û li Enqereyê jî mamosteyê bîrkariyê Înan Avşar jî dawî li jiyana xwe anîn. Avşar, beriya ku xwe bikuje dîmenek weşand û xwest ku malbat zarokên xwe neşînin dibistanan.

19'ê sibatê 2 kes

Di 19'ê sibatê de li Îzmîr û Antalyayê jî welatiyên bi navê Onûr K. û Halît Yilmaz xwe kuştin. 26 hezar û 450 lîra deynê Yilmaz ê banqeyê hebû. Yilmaz li pey xwe nîşeyek hişt û got ku ji ber ku nikare deynê xwe yê banqayê bide dawî li jiyana xwe aniye. Herî dawî 20'ê sibatê li navçeya Dîlovasi ya Kocaeliyê karkerê bi navê Bayram Komurcu, li depoya kargeha ku lê dixebitî, xwe kuşt.

Balkêş e, ji bo xwekuştina van mirovan ji hêla desthilatê ve tu daxuyanî nehat dayîn. Li gel vê rewşa kambax jî desthilata AKP'ê di polîtîkayên xwe yên şer û antîdemokratîk de israr dike.

Xwendekarên japon sertîfîkayên kurdî wergirtin

Di nav siyaseta tund û tûj a li dijî kurdan de, hinek geşedanên ku moralekî baş didin mirov jî hene. Li derveyî welat 12 hezar kîlometre dûrî Kurdistanê, xebatên li ser zimanê kurdî berdewam dikin. Perwerdeya kurdî ku sala borî li Japonyayê hatibû destpêkirin, berdewam dike û piştî salekê xwendekarên zimanê kurdî yên li Japonyayê bi şêweyekî fermî sertifikayên xwe yên asta duyemîn wergirtin. Di dîroka Japonyayê de cara yekemîn e ku li zanîngeha dewletê zimanê kurdî hat fêrkirin. Nêzî 60 kes tev li perwerdeya bi kurdî bûn. Ji van 60 kesan 40 kes xwendekarê zanîngehê, 20 kes jî sivîl in. Her çiqas Tirkiyeyê hewl da ku perwerdeya bi kurdî ya li Japonyayê asteng bike jî lê ev hewldana wan a li dijî zimanê kurdî bi ser neket.

Dê rastiyê ji kurdî fêr bibin

Perwerdeya zimanê kurdî dê li Japonyayê berdewam bike û zêdetir xwendekar fêrî kurdî bibin. Dê japon rasterast ji kurdî fêrî çand, huner, wêje û dîroka Kurdistanê bibin. Îsal jî di meha nîsanê de li Zanîngeha Lêkolînên Biyanî ya Tokyoyê waneyen kurdî dê berdewam bikin û di demeke nêzîk de her du zaravayên kurdî kurmancî û soranî bên fêrkirin. Çend roman û çîrokên japonî dê ji bo kurdî werin wergerandin û ji kurdî jî çend çîrok û roman ji bo japonî bên wergerandin. Dê ev kar û xebatên giranbuha bi destê xwendekarên fêrî zimanê kurdî bûne bên kirin. ***TOKYO***

HAYA MIN JI XEZÎNEYA STRANBÊJIYA KURDÎ TUNEBÛ

Ziman her tişt e

→ Încîl Selçûk

Dema ez stranên kurdî dibêjim ez gotinên wan, çîrokên wan hîs dikim û girêdanek di navbera min û guhdarvan de çêdibe. Min dizanibû kurd hene, kî ne û çi ne, ez ji rewşa kurdan agahdar bûm lê min muzîka wan nedizaniya, haya min ji xezîneya stranbêjiya kurdî tunebû

Gava di şahî û konserên kurdan de bi kurdî distrê, mirov dibêje qey ew bi eslê xwe kurd e. Wexta mirov guhdariya dengê wê dike, ew deng mirovî bi xwe re dibe çiya û zozanên Kurdistanê yên berz û bilind. Divê ez vê jî bibêjim; bi qasî stranên wê rûgeşiya wê jî dişibe ya keçên kurd. Min çend pirs arasteyî Eléonore Fourniau kir, ka ji bo çi û çawa keçeke fransiz hewcedarî bi strandina kurdî dibîne û ji nav bi dehan zimanan berê xwe dide stran û lorîkên me yên kurdî.

Çîroka stranbêjiya te ya kurdî çawa dest pê kir, ji ber çi te ji nav bi dehan zimanan berê xwe da stranên kurdî?

Ji bo ez bikaribim bersiva vê pirsê bidim, divê ez hinekî behsa jiyan û serpêhatiyên malbata xwe bikim. Dê û bavê min her du jî dîrokzan in, li ser Asyaya Navîn gelek lêkolîn kirine: li Ozbekistan, Tacikistan, Tirkmenistan, Kirgizistan û Kazakistanê. Ew bi gelek zimanên rojhilatî dizanin: farisî, tirkî, rûsî. Ew ne tenê Asyaya Navîn, belê Tirkiye û Kurdistanê jî baş nas dikirin. Gava ew ciwan bûne qasî du sê salan li Stanbolê jiyane. Xaltîka min jî li ser kurd û elewiyan doktora kiriye û demeke dirêj li Stenbolê maye. Bi malbata min re eleqeyeke mezin heye ji bo welatên Rojhilat, ne tenê Kurdistan bi giştî eleqeya wan ji bo çand û zimanên rojhilatî heye. Wexta ez piçûk bûm em li Ozbekistanê diman. Li wir ez hînî zimanê rûsî bûm, lê zimanê ozbekî hîn nebûm. Bi giştî ziman û dîrokê her tim bala min jî dikişand. Min li zanîngeha Fransayê beşa dîrokê xwend. Xwendina beşa dîrokê ji bo min ezmûneke pir zehmet bû, pê re pir westiyam. Min xwest salekê biçim welatekî cuda, bi tiştekî cuda re eleqedar bibim. Ez çûm Stenbolê. Stenbol ji bo xelkê Ewropayê cihekî pir dilniwaz e. Dema ez li wir bûm min dît gelek kes ji Ewropayê tên ji bo geşt û gerê. Li wir min despêkê dixwest hînî ziman, saz û muzîka tirkî bibim.

Erê, min dizanibû kurd hene, kî ne û çi ne. Ez ji rewşa kurdan agahdarbûm lê min muzîka wan nedizaniya, haya min ji xezîneya stranbêjiya kurdî tunebû. Ez wek xwendekarê mêvan çûm ÎTU'yê (Zanîngeha Teknîkê ya Stenbolê) beşa konservatûara muzîkê. Min du sal û nîvan li wir xwend. Li ÎTU'yê beşa dengî, ne hemû lê piraniya xwendekaran ciwanên kurd bûn. Lewma wan pir bala min kişand, ez hinekî ji wan hîn bûm. Me komek bi navê "Esman" ava kir. Despêkê em sê kes bûn paşê jî bûn çar kes. Berî em wê komê ava bikin hevaleke min a fransî demeke kurt li wir ma, wê hejmara jineke kurd a bi navê Xalîdeya Dengbêj dabû min. Gotibû ku ew diçe li cem wê xwe hînî dengbêjiyê bike. Ez matmayî mam ji ber ku min peyva dengbêjiyê qet nebihîstibû, min nedizanî ka dengbêjî çi ye. Min got ev çawa dibe ev salek e ez li vir im û min tiştekî wiha nebihîstiye. Ez rabûm li Xalîdeya Denbêj geriyam û min ew dît. Heyvê carek du car çûm cem wê min dersa dengbêjiyê jê girt. Ne derseke profesyonel bû lê em li ser meqam, qirik û deng xebitîn. Erê ne dersa akademîk bû lê ji bo min baş bû, ew tişteke cuda bû, ez hînî stranan dibûm. Paşê me komek ava kir. Pir enteresan e, di komê de wan alîkariya min dikir lê min jî di konservatûarê de alîkariya wan dikir. Mînak; min digot ev stran li dengê we tê, wan jî dixwend û bi ser diketin. Yanî ez dikarim bibêjim wan ez perwerde dikirim lê min jî ew ji bo bi kurdî bixwînin motîve dikirin. Min pir dixwest ew bi kurdî bixwînin, me wisa berdewam dikir.

Baş e, wexta tu bi kurdî distrê tu çi hîs dikî û stranên kurdî yên tu dixwînî tu gotinên wan jî fam dikî gelo?

Belê ez bi giştî gotinên wan fam dikim. Bi rastî ez nizanim ji ber çi ye, lê gava ez stranên kurdî dibêjim ez wê dîrokê jî hîs dikim pir û pir jê hez dikim.

Tu asta stranên kurdî çawa dibînî?

Ez di asteke pir jor de dibînim. Pir matmayî dimînim ji ber ku vê çandê gelek li ber xwe daye û li ber xwe dide. Civaka kurd ne tenê ya kevin bi xwe re tîne, di heman demê de jenerasyona nû jî edebiyat, sînema û muzîk tiştekî diafirîne. Min gelek mirovên emrê wan di ser 50'î re dîtin dengbêjî dizanibûn, ji bav û bapîran derbasî wan bûye. Lê mixabin ji wan derbasî jenerasyona nû nebûye, ev jî cihê xemgîniyê ye. Erê jenerasyona nû jî distrê, diafirîne lê erebesk û wekî din e. Dengbêjî kêm e mixabin. Belkî ez kêm dizanim lê min wisa dît.

Heke em stranên kurdî û yên cîhanê bidin ber hev, çi cudahî di navbera stranên me û yên cîhanê de hene?

Di stranên hemû cîhanê de hin tiştên hevbeş hene jixwe; çîrokên wan carna dişibin hev, muzîk û teknîkên deng jî lê ez nikarim bi hev qiyas bikim ji ber ku ez bi fransizî û îngilîzî nastirêm. Ji ber wê ez nikarim bi muzîka firansizî re miqayese bikim. Lê heke tu ji min bipirsî ka ji bo te çi ye ferqa wan, ez dikarim wiha cewab bidim: dema ez stranên kurdî dibêjim ez gotinên wan, çîrokên wan hîs dikim û girêdanek di navbera min û guhdarvan de çêdibe. Ji ber ku di her straneke kurdî de ji bo guhdarvanan bîranînek heye, belkî ji dayika xwe guhdar kirine, an jî birîneke wan tîne bîra wan. Mînak: min duh li salonê "lay lay" got, ew strana rojhilatê Kurdistanê ye. Kesên ne ji rojhilat bin belkî çîroka wê zêde nizanibin tenê wek stranekê guhdariya wê dikin lê yên ji rojhilat in ez dibînin ew li ber stranê bi hêstrên xwe nikarin û digirîn. Yanî her stranek fonksiyona wê di jiyana mirovan de cihê wê cuda ye, ez vê hîs dikim. Lewra her strana ku ez dixwînim ji bo min jî taybetmendiyek wê heye. Ez hema wisa ketober nastrêm, stranên bijarte dixwînim. Ez aşkera dikarim bibêjim ku ez bi hestiyarî nêzîk dibim hem hestên xwe tev lê dikim hem jî hestên guhdarvanan hîs dikim.

Wexta tu tev li şahî û konseran dibî, tu rastî bertekên çawa têyî, guhdarvan ji bo te eleqeyeke çawa nîşan didin?

Piranî bertekên baş in. Car caran ew dibêjin 'ev ji bo me şerm e, çawa dibe ew ne kurd e lê bi kurdî distirê em kurd in lê bi kurdî nizanin.' Ez dibînim ku di nav wan de tiştek şiyar dibe, bi rewşa xwe ya hatine asîmilekirin dihesin. Heke ez bixwazim ji bo zimanê kurdî tiştekî bikim encax ez bi vî hawî dikarim bikim. Belkî ne bi zanebûn dikim lê di encamê de ev derdikeve holê. Belkî di jiyana xwe ya rojane de hay ji asîmilebûna xwe nîn in lê gava yeke/î biyanî tê û bi zimanê wan distrê wê çaxê bi xwe dihesin, bi halê zimanê xwe dihesin. Ev jî ji bo min dibe enerjiyeke pozîtîf, ez dibînim ku bi kêrî hişyarkirinê tê.

Ez heman pirsê ji bo malbat û der dora te bikim. Bertekên wan li hember te çi ne, bi taybetî dayik û bavê te vê yekê çawa dibînin?

Ew bi karê min şanaz in. Zimanê bav û kalkê min oksîtanî ye, bavê min aktîvîstekî zimanê oksîtanî bû. Wî gelek xebat dikirin ji bo zimanê oksîtanî wenda nebe. Ez dibêjim qey hestiyariya min jî ji wir tê. Tê bîra min em jî gelek caran diçûn meş û çalakiyan. Bavê min havînan em dişandin kampan ji bo em bi oksîtanî hîn bibin û ji bîr nekin. Gelek caran ji me re digot: "Ji bîr nekin ku berî sed salan yek kesekî jî li van deran bi fransizî xeber nedida, lê niha bi giştî fransizî dipeyivin." Helbet ev hesasiyeta bavê min bandor li min jî kiriye. Ez jî wek bavê xwe li hember zimanên li ber talûkeya bişaftinê ne pir hestiyar im. Zimanê kurdî jî yek ji wan zimanên e ku ez di bin talûkeya wendabûnê de dibînim. Erê gelek kes bi zarokên xwe re bi kurdî dipeyivin lê mixabin min bi çavê xwe gelek malbatên nezan jî dîtin ku kurdî hînî zarokên xwe nedikirin, hay ji zimanê xwe nebûn. Ez carna difikirim; gelo piştî bîst salên din dê ev ziman di çi rewşê de be? Dizanim ne sucê wan e, ji bo zimanek bijî û nemire perwerdeya bi wî zimanî divê hebe. Mixabin kurd ji perwerdeya bi zimanê xwe bêpar in. Lê divê kurd ji bo zimanê xwe bixebitin. Mînak min hinek dîtin bi zarokên xwe re bi tirkî diaxivîn. Min got: "Çima tu bi kurdî napeyivî? Wî digot: "Dema mezin bibe ew ê bi xwe hîn bibe." Lê bi rastî ne wisa ye, divê kurd zarokên xwe despêkê hînî zimanê xwe bikin û her tim bi wan re bi kurdî biaxivin.

Duh di dema konserê de gotineke te bala min kişand, te got: "Ez gelek caran diçim komeleyên kurdan ji bo kurdiya min bi pêş bikeve lê wexta ez diçim cem wan rûdinêm ji ber ew piranî bi tirkî dipeyivin ez nema dikarim kurdiya xwe pêş bixim" te ev gazin wek henek kir, an bi rastî wisa ye ?

Erê, mixabin. Dema ez diçim komeleyên kurdan, mirovên li wir bi min re bi kurdî diaxivin ji ber ku ew dizanin ez dixwazim hînî kurdî bibim lê bi hev re, di nav hev de bi tirkî diaxivin. Ji bo min ev tiştekî ne xweş e.

Tu herî zêde kîjan dengbêjê/a kurd guhdarî dikî, ji kîjan dengbêjan hez dikî ?

Dengbêj Şakiro û M. Arifê Cizrawî, Cemîl Horo, Ayşe Şan û Meryem Xan û gelekên din, lê herî zêde Şakiro û M. Arifê Cizrawî.

Tercîha te ya zimanê kurdî, heke em bi yek hevokê bersiva te bixwazin sedem çi ye ?

Bê guman polîtîk e. Erê zimanek li ber wendabûnê ye lê miletê kurd jî di bin zordariyê de ye. Lewra ez dibêjim ji bo min ne tercîhek bû; diviyabû ez bikim û dikim. Wek ku ez bibêjim ev qedera min e û ez qedera xwe dijîm.

Herî dawî wek dengbêjeke bi kurdî distrêyî, dixwazî ji guhdarvanên xwe re çi bibêjî, peyama te ji bo wan çi ye ?

Rast e muzîk gelek tiştan di xwe de dihewîne lê rewşa miletê kurd jî li ber çavan e zordestî li ser heye. Bila zimanê xwe ji bîr nekin, ji ber ku ziman dîrok e, ziman nasname ye. Heger zimanê xwe ji bîr bikin ew ê wenda bibin. Ziman her tişt e.

Eléonore Fourniau kî ye?

Eléonore Fourniau di sala 1987'an de li Parîsa Fransayê hatiye dinyayê. 3 salan li Ozbekistanê jiyaye. Perwerdeya xwe li ser dersên piyanoyê dîtiye û di sala 2010'an de beşa dîrokê xwendiye û bi dawî kiriye. 5 salan li Tirkiyeyê jiyaye. Tev li gelek konser û festîvalan bûye û bi hunermendên wekî Mîkaîl Aslan, Sylvain Barou, Efrên Lopez û gelekên din re derketiye ser dikê û stran gotine. Elêonore Fourniau stranên kurdî dibêje.

Reyhan Îke

Dibistana bilind

Têkiliya dayika me ya bi me re, têkiliya me ya bi me re diyar dike. Têkiliya me ya bi me re, têkiliya me ya bi derdorê re kifş dike. Em bi dayika xwe re têkiliyek çawa saz bikin, têkiliya me bi wê re saz kirî, berê jiyana me diyar dike. Anku bijartin û çarenûsa me beralî dike ev têkilî. Lewma pergalên serdest, ji pêşdibistanan bigire heta dibistanên 'bilind' me dixin nav çerxeke din û vê têkiliyê ji destpêkê ve dixin bin kontrola. Bi vê riyê hewl didin bibin xwedayên ku çarenûsa me diyar bikin! Bi vê wateyê qedexeya ziman, qutkirina me ya ji dayikê ye. Qutkirina me ya ji aqilê me yê hestiyar e. Qutkirina têkiliya me ya bi me re ye. Herî zêde em bi vê riyê ji xwe tên dûrxistin. Ji ber 'ziman giyana civakê ye.' Jixwe dema em ji xwe dûr bikevin, ew bêjin me hûn çine, kêm zêde em jî xwe wisa dihesibînin.

Bi vî awayî dixwazim balê bikişînim ser lêkolînekê. Min ev lêkolîn di rojnameya Independentê de xwend. Li gor vê lêkolînê, genetîka dayikê, diyar dike ka wê zarok çiqas jîr be. Genetîka bav, ti ferqê naafirîne. Ji ber ev gen bi riya kromozoman tên veguhastin. Di zilam de yek, di jinê de jî du kromozom hene. Di dema çêbûna zarokan de, kromozoma dayikê ya bav bêbandor dike.

Li gor heman lêkolînê, genên ji bav derbas dibin, ajoya zayendî, xwarin û êrîşkariyê vediguhêzin û di beşên lîmbîk ên pergalê de cih digirin. Lê lêkolîner, di beşa korteksa seberal a ku fonksiyonên zanînê yên wekî watedayîn, hizirandin, ziman û plansazî tê de cih digirin de, li rastî şanikên ku ji genetîka bav tên nehatine. Li gor heman lêkolînan zeka ji sedî 40 heta 60'î genetîk e. Hema bêje nîvê zekaya me ya din jî ji derdorê tên wergirtin. Ma ne balkêş e ku tenê di zimanê kurdî de peyva ZIMANÊ ZIKMAKÎ tê bikaranîn? Gelo ev gotina kurt ne piştrastkirina van lêkolînan e? Têkiliya ziman û aqil di vê derê de derdikeve pêşberî me.

Her wiha di gelek lêkolînan de hatiye piştrastkirin ku dayik di zekaya ne genetîk de jî xwedî roleke sereke ye. Ji ber zarokên ku di warê zekaya hestiyar de têr û têkiliya wan bi dayika wan re baş, ji xwe bawer in û dikarin zêdetir pirsgirêkên xwe çareser bikin.

Tam jî ji ber vê yekê ye em ji dibistana xwe ya herî bilind tên qutkirin. Di hemû zindiyan de dibistana herî bilind a ku fêrî jiyanê dike dayik e. Ji bo civakekê xetereya herî mezin, birîna zimanê dayikê yê wê civakê ye. Dayika lal dibe, dibe civaka lalbûyî. Civaka lal, dikeve rewşeke bêçare û bê mecal. Ji ber bi aqilê wê civakê hatiye lîstin. Aqilê wê hatiye dizîn. Di wateya rast de dayik aqil û hişê civakan e.

Di vê xalê de dixwazim balê bikişînim ser du mînakan. Yek têkiliya Lordê Eylaleta Serhedê, ya din jî têkiliya hunermendekî kurd ê ji Mêrdînê, Xeyrî Kasaç e. Lordê Eyaleta Serhedê di hevpeyvîneke xwe de dibêje bi saya dayika xwe dest bi guhdarîkirina dengbêjiyê kiriye. Her wiha dibêje dema diya min dengbêj guhdar dikirin, digiriya û ew ji wê giriyê bandor bûye. Ya rast bi rondikên dayika xwe re berê xwe daye çand û zimanê xwe, fêrî dîroka civaka xwe ya li deng hatî barkirin bûye. Paşê bûye têkoşer û li dijî diziya li ser çand, huner û zimanê kurdî tê kirin dest bi têkoşînê kiriye. Heta niha xebatên gelek hêja kirine. Ji ber wendabûna her peyvek ji zimanê dayika me, tê wateya kuştina şanikek ji çanda me.

Xeyrî Kasaç jî di bernameyeke televîzyonekê ya Tirkiyeyê de xwest lorîkekê bibêje. Lê gotin û egerên wî yên ji bo gotina wê lorîkê, ji lorîka gotî gelek dirêjtir bûn. Ev yek bû sedema gelek şîrove û nirxandinan di medyaya civakî de. "Gazindeke dayika min heye kekê Acûn. Ez her dibêjim dayê, tu stranên min çawa dibînî? Ew jî dibêje 'kurê min, ez ji stranên te fêm nakim.' Diya min yek peyveke tirkî jî nizane. Her dibêje 'tu çima straneke kurdî nabêjî?' Ger destûra we hebe, biçûk, pir biçûk, dema ez zarok bûm lorîkeke di guhê min de gotî heye. Ji bo ez dilê wê xweş bikim, dixwazim lorîkek pir biçûk, bîst çirkan bibêjim."

Bi ya min tiştek baş kir. Ji xwe ger ne weşana zindî bûya, destûra vê jî nedihat dayîn. Bi zanebûn an bi nezanî, golek ji bo qeleya Acûn hat avêtin. Ya din şerm û rûreşiya yên bûne sedem e ku em egera lorîkên xwe ji lorîkê dirêjtir vebêjin. Aha, hunermend, nivîskar, akademîsyen, rewşenbîr, siyasetvan û zanayên me yên zanko û dibistanên 'bilind' xwendine, divê çareyekê ji vê birînê re bibînin. Divê qelemşûrên me yên medyaya civakî jî biryara vê bidin; em ê bibin têkoşerên çand û zimanê xwe, an em ê Xeyrî Kasaç tawanbar bikin û gazindan ji yên vê şermê li ser me ferz dikin bikin bi zimanê wan?

Dibe ku em hemû nikaribin bibin 'Lord.' Lê hewla xwebûnê, pêdiviya rêzdariya me ya li hemberî me ye. Têkiliya me ya rast a bi me re ji vê derê dest pê dike. Vêca pirsa rast ev e; em ê bi kîjan aqilî têkiliya xwe ya bi xwe re saz bikin?

Roja we ya zimanê zikmakî pîroz be!

Zimanê me çima girîng e?

Şêrgele

Dixwazim nivîsa min li ser wateya zimanê min be. Li ser dîroka ziman, ez ê tiştekî nebêjim. Tenê çend gotin û pirsgirêkên em pê re rûbirû dimînin ez ê şîrove bikim.

Ya yekemîn ziman an jî zimanê me çima girîng e?

Ji destpêka dîrokê heta niha gelek filozof, nivîskar û zanyaran girîngiya ziman destnîşan kirine û ji bo ziman gelek nivîsandine. Yên ku nivîsandine jî êşa ziman kişandine û birînên wan çêbûne. Dema em li welatê xwe Kurdistanê dinihêrin hê jî em êşa wê dikişînin û birînên me hene.

Kesên dagirker ji bo zimanê xwe serdest bikin serî li hemû rê û rêbazan didin. Ji bo vê yekê jî teknolojiyê bi kar tînin. Mînaka wê jî dewleta tirk e. Îro tu li televîzyonan dinihêrî bi sedan qenalên bi zimanê tirkî hene. Ev qenalên tirkî her rojê çend rêzefîlman û bernameyan pêşkêş dikin. Bi vê yekê bi milyonan kesan bi xwe ve girê didin û wan kesan mehkûmî xwe dikin. Li ser facebook û twitterê jî bi milyonan bikarhênerên zimanê tirkî hene. Ji bo rojname, pirtûk û kovaran jî ev yek derbasdar e. Lê em bi zanebûn an jî nezanî dibin kesekî/e ji vê dagirkeriyê. Ji bo ku nivîsên me zêde werin xwendin em bi zimanê tirkî dinivîsin. Bi vî awayî em bi xwe vê dagirkeriyê bi pêş dixin. Tu çiqasî bi zimanê dagirkeran binivîsînî, tu yê ewqasî xizmetkarê wan bî.

Dixwazim mînakekê ji welatê Belçîkayê bidim. Belçîka di bin serweriya fransiyan de bi pêş ket. Ji bo zimanê fransî belavî gelek deveran bibe polîtîkayek taybet hat meşandin. Di fermiyetê de jî ev ziman hat ferzkirin. Lê aliyekî kesên ji civaka flaman hebûn û vê yekê di warê ziman de rê li ber pirsgirêkan vekir. Ji ber ku dewletê kesên bi fransizî dizanîbûn dikirin karmend û di wezîfeyên jor de cih dida wan. Li dijî vê yekê jî tevgereke flamanan a ziman ava bû. Vê tevgerê tenê li ser ziman xebat kirin. Ji bo bipêşxistina zimanê xwe gelekî ked dan. Her wiha nexşeyek li ser bikaranîna zimanê flamanî amade kirin. Bi vê nexşeyê re aşkera bû ku nîvê Belçîkayê bi zimanê flamanî diaxive. Lê tevî vê yekê jî di fermiyetê de cih nedidan wan. Tevgera ku ji bo ziman ava bû di demeke kin de hişt ku namzetên flamanan di meclisê de cih bigrin. Van kesan jî li meclisê doza ziman bi pêş xist. Bi demê re hejmara van kesan li meclisê zêde bû û kirin ku flamanî jî bibe zimanekî fermî yê meclisê. Her wiha li deverên fermî jî zimanê flamanî hat bicihkirin. Û gav bi gav zimanê flamanî li her devera Belçîkayê bi cih bû. Îro jî li Belçîkayê herî zêde zimanê flamanî tê bikaranîn û hejmara nişte-cihên vî zimanî bikartînin jî zêde ye. Bêguman ev pêvajoya ez behsa wê dikim zêdetirî sed sal berê ye. Yanî di carekê de çênebû.

Bi vê mînakê jî dixwazim vê bêjim: Xebateke ji bo ziman dikare encamên siyasî, çandî û civakî jî bi xwe re bîne. Eger em kurd jî ji ziman dest pê bikin, dikarin heman encamê bi dest bixin. Ji bo vê yekê jî dîrokeke me heye. Ewqas televîzyon, rojname, pirtûk û kovar jî bingeha hebûna me ne.

Dema tu li dewleta tirk binihêrî dîrokeke wê an jî çandeke wê tinebû. Lê bi dagirkeriyê zimanek ava kir. Niha jî bi vî zimanî dîroka xwe çêdike. Li cem me hem dîrok hem jî ziman heye. Ya girîng bikaranîna wan e. Hêvîdar im ku Xwebûn jî bibe sedema xwelêvegera zimanî.

Ziman û Raman

Samî Tan

Ziman û şêwaza dilsojên kurdî

Gelî xwînerên hêja û berkeftî, ev dem û hemû demên we xweş û geş bin. Van rojan bi boneya Roja Zimanê Dayikê ya Navneteweyî mijara parastin û geşkirina zimanê kurdî di rojevê da ye. Li ser vê mijarê bername tên amadekirin, panel û gotûbêj li dar dikevin. Lê mixabin ev mijar zêde nakeve rojeva piranîya kurdan. Dîsa em komek mirov dilsojên zimanê kurdî li ser vê mijarê dipeyivin, em bi gilî û gazinan dilê xwe diperitînin.

Êdî dem hatiye, belkî derbas jî dibe, divê em vê mijarê bixin rojeva civaka xwe, di vî warî da rê û rêbazên nû peyda bikin. Her wekî me gelek caran gotiye, êdî divê meseleya parastin û geşkirina zimanê kurdî bikeve malan. Ji bo vê yekê gavên pratîk pêwîst in, her wekî pêşîyan gotiye: *"Xebat ker e, tu biajoyî, dê here."*

Erê ji bo xebatê amadekarîyek pêwîst e; rast e, divê em bala xwe bidin karûbarên xelkê, ji kirinên wan hin tiştan hîn bibin. Lê belê heta mirov nekeve avê, hînî avjenîyê nabe. Her kes dê ji alîyê xwe dest bi kar bike, lê dê ji hev hîn bibe, ji hev hêz û quwetê bigire.

Her wekî Sebrî Botanî gotiye:
Ji bo pêşvebirina ziman
Evro hene hezar dergeh
Eger bawer nekin ji min
Dişêm bînim hezar belge

Lê xebat û çalakîyên me hê jî di çarçoveyek teng da dimînin, nakevin nav gel. Nîqaşên me yên li ser ziman jî pirî caran di çarçoveyeke teng a teknîkî da dimînin û vê pêkenoka li jêr tînin bîra mirov:

Mamoste ji şagirt pirsî: Hêk nêr e, yan mê ye?

Şagirt got: Eger çêlika di hêkê da mirîşk be, hêk mê ye, û eger dîk be, bêguman hêk nêr e.

Lewma jî kesên li ber destê me perwerde dibin, heke mirovek wateya cînavk, tewang, daçek û hwd. nezane, ji wan kirî ku ew bi kurdî nizane. Ji ber vê helwesta xwe, ew pirî caran li şûna kil bikin, kor dikin. Ew wekî cendirmeyên zimanê kurdî tevdigerin û nahêlin ku mirov li gorî dilê xwe, bi kurmancîya ku pê dizanin bipeyivin. Mirov ji tirsa belakiriya wan newêrin bi kurdî bipeyivin. Em qala zimên dikin, lê zimanê ku em bi kar tînin, ne dilkêş û balkêş e. Xuya ye ku me wekî *Xanî zimanê xwe neînabe nizam û întizamê û cefa nekêşaye ji bo yê amê.* Ji ber ku pirî caran em napêjin û dibêjin, şêwaza me wekî girara rijî lê tê, kêfa kesî jê ra nayê.

Belkî divê em Mîr Celadet ji xwe re nekin mertal û gotinê li nav çavên mirovan nexin û nebêjin: *"Kuro eyb e, şerm e, fehit e. An hînî zmanê xwe bibin, an mebêjin em Kurd in. Bê zman kurdîtî ji we re ne tu rûmet e, ji me re rûreşîyeke giran e."* Ev şêwaz di roja îroyîn da kesî li kurdî venagerîne. Em zimanekî xwe, şêwazeke dilkêş mirov bikêşin nav xebata parastin û geşkirina zimanê kurdî. Li şûna ku em bibêjin:

Vejîne zimanê xwe ey xwendevan,
Nebûye milet hîç kesek bê ziman
Çêtir e ku em bibêjin:
Zimanê me xweş û xeroş û ciwan
Eger baş bizanî tu nakî ziyan

Em xweşîya zimanê xwe nîşanî mirovan bidin, em bi berhemên balkêş û dilkêş wan bikin bengîyê/a zimanê kurdî.

Aborî û Civak

Ramazan Tunç
ramazan.tunc@live.com

Bêkarî û derûniya civakê

Her roj li derekê xwekuştinek pêk tê. Pêwîst e mirov hinekî li ser têkiliya piyaseya serbest, biryarên hikûmetan û aboriyê bisekine. Derûnî û biryardayîna aborî, finans û zihakirina dahatê mijareke girîng e, ku aborînas gelekî li ser disekinin.

Li gorî daneyên Saziya Îstatîskê ya Tirkiyeyê (TUÎK) yên sala 2019'an, kesên ku li Tirkiyeyê dibêjin, em ji jiyana xwe kêfxweş in rêjeya wan %52,4 e. Ev reqem di sala 2003'an de ji sedî %59,6 bû. Dîsa li gorî reqemên TUÎK'ê yên bêkariya gištî ji sedî %13,3 ye û hejmara kesên bêkar li Tirkiyeyê 4 milyon û 308 hezar kes in. Her çiqas ev rêje biçûk xuya bike jî, di nav nifûsa ciwanan de ev rêje ji sedî %24,5 e û li gorî nîveka dewletên Yekitiya Ewropayê (YE) ev rêje gelek zêde ye. Ev jî tê wateya ku li Tirkiyeyê gelek kes li kar digerin û karekî ku debara xwe pê bikin nabînin.

Di pergala aboriyê de ciyê derûniyê gelekî girîng e. Richard H. Thaler ji ber xebat û lêkolînên xwe yên der barê aborî û derûniyê de di 2017'an de Xelata Nobelê ya Aboriyê wergirt. Di xebatên xwe de Thaler li ser pira di navbera aborî û derûniyê de disekine. Thaler dibêje, derûniya kesan û piyaseya serbest rasterast bi hev ve girêdayî ne. Ji derveyî Thaler, Emile Durkheim jî li ser derûniya civakî disekine û di der barê xwekuştinê de analîzên berfireh dike. Durkheim dibêje, "Xwekuştin bi her awayî fenomeneke (diyarde) civakî ye û bi her awayî jî anomaliyeke civakî ye." Lewra Durkheim dibêje, 3 sedem an jî fenomenên xwekuştinê yên civakî hene. 1. Xwekuştina Egoîstîk, 2. Xwekuştina Altrustîk 3. Xwekuştina Anomîk. Hemû xalan bi kûrahî dinirxînê Durkhaim û mirov dikare bi kûrahî li ser bisekine lê ez dixwazim li ser xala 3'yemîn bisekinim. Durkheim, xwekuştina anomîk jî wek "anomie" bi nav dike. Durkheim tîne ziman, ku di demên qeyranên aborî de pergala aboriya kapîtalîst ku bi destên hikûmetan fonksiyona maf, jiyan, moral û exlaqî bi cî nake, di nav civakê de ji bo normalkirina xwekuştinê dibe sedema herî mezin.

Aboriya kapîtalîst jî, tengaviyên mezin ji dahatê dikişîne. Li Tirkiyeyê, ji ber ku çavkaniyên wek neftê, gaza xwezayî û yên din ên bin axê ku dahatên hikûmet û dewletan zêde dikin nîn in. Hemû dahata budceyê ji bacên li ser mal û xizmetan tê berhevkirin. Dahata bacan jî wek ku Laffer bi nav kiriye, girêdayî rêjeya bacê ye. Aborînas Laffer diyar dike ku "her çiqas rêjeya bacê zêde be, dahat jî ew qas dikeve." Hikûmet an jî dewlet heta rêjeyeke optîmûm dikare rêjeya bacê zêde bike lê piştî wê asta optîmûm-herî baş, dahata ji bacan kêm dibe. Ev dahat jî pêwîst e li gorî pîvan û nirxên birêzik bên birêveberin.

Li gorî qanûnên Adoolph Wagner jî, tê gotin ku bi piranî di demên şer de hikûmet hewl didin ku bacan zêde bikin.

Li gorî qanûna bi hejmara 5018'an li Tirkiyeyê hemû kes û saziyên gištî pêwîst e li gorî zelalî û hesabdayînê tevbigerin. Li gorî qanûna bi hejmara 6362'yan manîpulasyon jî qedexe ye û sûc e. Kesên ku li gorî van qanûnan tevnegerin sûc dikin.

Ji 2003'yan heta 2020'an hikûmeta ku desthildariya xwe li Tirkiyeyê didomîne, derûniya civakê xerab kiriye û a niha kesên ku dixwazin kar bikin û kar nabînin gelek zehmetiyên civakî û derûnî dijîn. Li gorî Thaler biryarên ku kes didin, tesîra wan li ser piyaseya serbest heye û rasterast ev biryar bandorê li piyaseyê dikin. Lewre xwekuştin roj bi roj zêde dibin. Lewra wek ku Durkheim aniye ziman, di nav civakê de xwekuştin normal tê dîtin. Ji ber ku polîtîkayên aborî û finansê pewîstiyên gel bi cî nayînin, qeyran zêde kûr dibe. Dahata ji bacan kêm dibe. Kesên ku li gorî qanûnan berpirsiyar in, ji bo xerckirina dahatên bacan ên ku ji gel hatine berhevkirin, hesab bidin, di şûna hesabdayînê de ser bêrêtiyê dinixêmin. Kesên ku di polîtîkayên aborî û finansê de biryardar in jî çav berdidin pereyên ku ji bo erdhej û alîkariyan hatiye berhevkirin. Hikûmeta ku ji ber zêdekirina rêjeya bacan nikare bacan berhev bike, li dijî qanûna 5018 'an tevdigere û zelalî û hesabdayîna lêçunên saziyên gištî dûr dikeve. Ku Emile Durkheim û Wagner sax bibin, ew ê Tirkiyeyê wek laboratuvareke civakî ji xwe re bi kar bînin. Xelk birçî ye, bêkar bi milyonan in, her roj nûçeyên di der barê xwekuştinê de hene û rayedar bûne demogogên ku ruhê McCarthy vedijînin û li ser ekranan manîpulasyon û demogojiyê dikin. Hiqûmet jî bûye hikûmeta aşê dînan. Bê av digere.

Ferhenga aborî û finansê

Bêkarî-Unemloyement: Dema ku ji civakê hin kes li derfeta kar û xebatê bigerin û vê derfetê bi dest nexin, ji vê rewşê re bêkarî tê gotin. Pîvana ji bo bêkariyê ew e ku kes li kar û xebatê bigerin û vê derfetê bi dest nexin. Kesên ku li vê derfetê negerin, li gorî statîstîkê bêkar nayên hesabindin.

Bac -Tax: Dewlet ji bo ku xizmetê pêşkêşî gel bike, bi beşdariya gel, bi alîkariya gel dahatê kom dike. Ji vê dahatê re bac tê gotin ku gel pê beşdarî rêvebirina civakê dibe. Di Magna Cartayê (1215) de ji bo ku balê bikişîne ser beşdarbûna gel a rêvebirin û biryardayînê, dibêje, "no taxation without representation - Ger nûnertî nîn be bacwergirtin jî nîn e."

Manîpulasyon-Manipulation: Bi armanca ku destkeftiyên xwe xurt bikin, hin kes pergal û tevgera piyaseyê xerab dikin, bi kirinên xwe yên ne rast dikin ku piyase çewt tevbigere, ji kirinên bi vî rengî re manîpulasyon tê gotin. Di hemû pergalên piyaseyên serbest de manîpulasyon sûc e.

Qanûna Wagner (Wagner Law): Aborînasê almanî Adolph Wagner li ser komkirina rêjeya herî baş (optimum) disekine, ji bo komkirina bacê rêgezekê pêşniyar dike. Li gorî Wagner di demên şer de hikûmet hewl didin ku bacan zêde bikin. Wexta ku hikûmet bacan zêde dikin, gel dîsa hînî rêjeyên nû yên bacê dibe. Wagner vê rewşê wek "tesîra cîguhestinê an jî jnûvebicîkirinê -displacement effect" bi nav dike.

Kevana Laffer: Li gorî Wagner wexta ku hikûmet di demên şer de bacan zêde bike, tesîra cîguhestinê derdikeve holê. Li gorî Kevana Laffer jî hikûmet heta merhelayekê dikare rêjeyê zêde bike. Piştî wê merhaleyê rêje zêde bibe, dahat kêm dibe.

Gotineke pêşiyên me

Aşê Dînan Bê Av Digere: Ji bo kesên ku bingeha wan tune ye, bi gotinan û manîpulasyonan karên xwe didomînin, xebat û gotinên wan çiqas ji heqîqet û rastiyê dûr bin jî karên wan dimeşin, tê bikaranîn.

Avakirina hêzeke hevpar hewce ye

Navenda Nûçeyan

Aloziya siyasî û leşkerî ya li Rojhilata Navîn bandora xwe bi taybetî li çar parçeyên Kurdistanê dike. Ji ber ku kirdeyê esasî yê Rojhilata Navîn jî gelê kurd e. Hezên hegemonîk dixwazin Rojhilata Navîn ji nûve dîzayn bikin û beyî kurdan. Lê hewldanên wan ên dîplomatîk û leşkerî li hemberî rastiya kurdan têk diçin. Ev tişt xwe li rojavayê Kurdistanê bi zelalî nîşan dide.

Li gel geşedanên gištî yên siyasî, kurdistanî niha li ser yekitiyê disekinin. Li çar parçeyên Kurdistanê û Ewropayê kurd nîqaşên xwe yên der barê yekitiyê de berfireh kirin. Bi nîqaşên ku di demên dawiyê de hatin kirin, encamên girîng derketin holê. Niha her qad di nav xwe de nîqaşên berfireh dike. Aliyek partiyên siyasî, aliyek hunermendên kurd, aliyek jî sazî û rêxistinên civakî yên kurd in.

Kurdên ku xwe li Kurdistanê bi rêxistin kirine niha jî bi civîn, komxebat û konferansan li ser hewcedariya yekitiyê disekinin. Di serî de partiyên siyasî yên Başûr, Bakur û Rojava civînên xwe li herêmên xwe pêk anîn. Tevî ku hin partî xwe dûrî wan nîqaşan dikin jî helwest girîng in. Partiyên siyasî yên Bakur ji bo kar û barên yekitiyê, berê xwe dan Başûr û bi partiyên siyasî re rêzecivîn li dar xistin.

Li gel partiyên siyasî qada çand û hunerê jî xebatên xwe yên yekitiya neteweyî berfireh kirin. Di serî de li Ewropayê meşeke mezin hat lidarxistin û piştre bi tevlêbûna hunermendan li Ewropayê civîneke gištî pêk hat. Piştî civînê jî hunermend berê xwe dan başûrê Kurdistanê li Silêmanî, Hewlêr û Dihokê bi hunermendên başûrî re civiyan û plansaziya xwe ya pêşerojê çêkirin.

Di encamên nîqaşan de tişta ku herî zêde derdikeve pêş jî yekitiya hezên leşkerî ye. Endamê Rêveberiya Yekitiya Niştimanî ya Kurdistanê (YNK) û fermandarê pêşmergeyan Westa Resûl têkildarî yekdengiya gelê kurd axivî û da zanîn ku heke gelê kurd yekrêz, yekdeng û yekgirtî nîn be, nikare ji qonaxên dijwar ên tevahî Rojhilata Navîn xwe rizgar bike. Resûl mijara yekitiya hêzên leşkerî jî wiha nirxand: "Min sê sal beriya niha gotibû ku hêza leşkerî ya hemû alî û rêxistinan heye û pêwîst e ku komîteyeke leşkerî ya hevbeş ji bo parastina axa Kurdistanê hebe. Niha wext hatiye ku ev komîte bê avakirin."

Li Iraqê krîza hikûmetê

Li Iraqê ji 1'ê cotmeha sala 2019'an ve li dijî gendelî, bêkarî û daxwaza xizmetê xwepêşandan tên lidarxistin. Di xweşpêşandanan de daxwaza îstifakirina hikûmetê tê kirin.

Komîsyona Bilind a Mafên Mirovan a Iraqê bîlançoya dawî ya kesên di xwepêşandanên li Iraqê de hatine kuştin û birîndarkirin aşkera kir. Ji 1'ê cotmeha 2019'an ve di xwepêşandanên Iraqê de 545 kesan jiyana xwe ji dest daye ku di nav wan de 17 endamên hêzên leşkerî yên dewletê jî hene. Her wiha nêzî 24 hezar kes jî birîndar bûne.

Li gorî agahiyên komîsyonê 89 kes hatine revandin, zêdetirî 2 hezar û 800 kes hatine binçavkirin û piştre jî 38 kes hatine berdan. Li gorî hin çavkaniyan jî hejmara kesên jiyana xwe ji dest dane 600 e û hejmara birîndaran jî nêzî 30 hezar kesî ye.

Li ser daxwaza xwepêşandêran serokwezîr Adil Abdulmehdî ji serokwezaretiyê îstifa kir. Serokkomarê Iraqê Berhem Salih ji bo hikûmetê bi sunî, şiî û kurdan re hevdîtin pêk anîn. Lê belê ji hevdîtinan encam derneket û ji ber vê yekê jî di destpêka meha sibatê de Muhammed Tewfîk Allawî ji bo avakirina hikûmetê hat wezîfedarkirin. Allawî bi gelek partiyan re li ser avakirina hikûmeta nû hevdîtin kirin. Hin ji wan partiyan piştgirî dan wî. Tê gotin ku hin partî jî bi erênî nêzîk nebûne. Pêvajoya ji bo avakirina hikûmeta Allawî ya ji kesayetên serbixwe pêk tê dewam dike. ***BEXDA***

Şêniyên Idlibê berê xwe dan cihên bi ewle

Şerê ku li Idlibê diqewime bêhtir bandor li şêniyan dike û gelek kesan ji neçariyê cih û warên xwe terikandin. Şêniyên Idlibê berê xwe didin cihên bi ewle. Li gor dezgehên çapemeniyê nêzî milyonek kes ji warên xwe derketin. Gelek koçber berê xwe dan herêmên rêveberiya xweser.

Gelek koçber li kampa Ebû Qibî ya li rojavayê bajarê Reqayê dimînin. Hinek koçber li avahiyên giştî, hinek jî di malên wêrankirî de dimînin. Rêveberiya xweser hewil dide ku ji bo koçberan kampên berfihertir ava bike.

Şêniyên koçber bûne diyar dikin ku di serî de cihên sivîl hatine bombekirin ku ev der bên valakirin. Şêniyan destnîşan kir ku ji bo parastina gel hêzên leşkerî hatibûn û li Idlibê bi cih bûbûn, lê niha rewş guherî û şênî nerçar man ku koçber bibin. Koçberê bi navê Haşim Hisrem ji çiyayê El-Zawiyeyê diyar kir ku zarokên wan ji ber bombebaranan nikarin razên û got: "Niha em hatin cihê bi ewle. Em li vir dizanin ku cudahiyek heye, nêzîkatiyeke germ heye. Em bang li şêniyên Idlibê dikin ku bên herêmên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê. Li vir aramî heye."

Endamê meclisa koçberan Mihemed El-Umer da zanîn ku heta niha 180 malbat gihaştine Reqayê. El-Umer diyar kir ku ew bi hevkariya meclisa sivîl û rêxistinên mirovî alîkariyên pêwîst pêşkêşî koçberan dikin. ***REQQA***

Lihevkirina li Idlibê têk çû

Diyar dibe ku lihevkirina Rûsya û Tirkiyeyê têk çûye. Têkçûyîn dê bandoreke çawa li ser siyaseta Rûsya û Tirkiyeyê bike ne diyar e. Bi taybetî jî dê Tirkiye di hêla siyaseta hindûrin ve bikeve nava aloziyan

Geşadanên siyasî û leşkerî yên li Idlibê didomin. Têkiliyên di navbera Rûsya û rejîma Sûriyeyê de rewşa Tirkiyeyê kir aloziyê. Diyar e ku peymanên di navbera her du dewletan de têk çûne. Ji aloziyê aşkera ye ku navbera Rûsya û Tirkiyeyê niha ne baş e û di demên pêş de dê encamên cuda derkevin holê. Gelo encamên ku derkevin holê dê bandorek çawa li rewşa civakî, siyasî û aborî ya Tirkiyeyê bike?

Serokê Hevbendiya Nîştimanî ya Demokratîk a Sûriyeyê ya Tebqayê Selam Hisên, li ser rewşa Idlibê, helwesta Tirkiyeyê, guhertina hevsengiyên li ser erdê, nakokiyên Rûsya û Tirkiyê nirxandin. Hisên destnîşan kir ku şerê li Idlibê şerekî dualî yê li dijî dagirkerî û terorê ye û wiha got: "Bi nêrîna min şerê li Idlibê dê dawî li hebûna Tirkiyê ya li ser axa Sûriyeyê bîne. Êdî Tirkiye bi tenê maye. Ji ber wendahiyên Tirkiyeyê yên dubare û stratejiya têkçûyî ya ku Tirkiye dimeşîne, li qada navneteweyî têk çûye."

Hisên di axaftina xwe de bal kişand ser çeteyan û diyar kir ku Tirkiyeyê muxalifên Sûriyeyê veguherandine komên çete û ji bo armanc û berjewendiyên xwe bi kar tîne. Hisên mijar wiha nirxand: "Şerê îro yê li bajarê Idlibê diqewime, mîna bidawîbûna lihvekirinên Astana, Soçî û lihevkirinên din e. Têkçûna Tirkiyeyê ya li Idlibê dê têkçûna hemû peymanên Tirkiyê yên der barê Efrîn, Serêkaniyê û Girê Spî de be."

Dê li dijî hikûmetê derkevin

Hisên behsa têkiliyên Tirkiye û Rûsyayê kir û da zanîn ku Tirkiye piştî lê hay bû ku lihevkirinên bi rûsan re têk çûne, ji bo ji Sûriyeyê destvala dernekeve ket nav hewldanan û wiha got: "Muxalefeta hundir a Tirkiyeyê dê li dijî hikûmeta Erdogan derkeve, ji ber ku leşkerên tirk xist şerekî bi vî rengî. Her wiha ew ê malbatên leşkerên ku di şerê li Sûriyeyê de hatine kuştin sedema kuştina zarokên xwe bipirsin. Ev yek dê bandorê li siyaseta derve ya Tirkiyeyê jî bike."

Piştgirî nayê dayîn

Hisên rol û mîsyona Amerîka û NATO'yê jî şîrove kir û wiha axivî: "Tirkiye li benda Amerîka û NATO'yê ye. Dixwaze teqez bike gelo NATO û Amerîka amade ne Tirkiyeyê biparêzin. Amerîkayê daxuyanî dabû û gotibû 'leşkerên tirk ên ku li Sûriyeyê tên kuştin "şehîd" in.' Lê Erdogan got ku ev daxuyanî kêm e û daxuyaniyên manewî yên NATO'yê ji bo piştgiriya bi Tirkiyeyê re têr nakin. Erdogan dixwaze ku NATO çekên xwe bişîne Idlibê ku li hemberî Rûsya û artêşa Sûriyeyê bisekine. Heke Amerîka û NATO piştgiriyeke aktîf nedin Tirkiyeyê dê Tirkiye neçar bimîne ku ji tevahiya Sûriyeyê vekişe. Diyar e ku Tirkiye bi tenê maye û tu kes piştgiriyê nadê." ***TEBQA***

ENKS'î bi wezîrê tirk re civiyan

Nûnerên Encûmena Nîştimanî ya Kurdên Sûriyê (ENKS) ku di nav komên bi navê "Muxalefeta Sûriyeyê" de bûn û di heman demê de nêzî Partiya Demokrat a Kurdistanê (PDK) ye li Enqereyê bi Wezîrê Karên Derve yê Tirkiyeyê Mevlut Çavûşoglû re civiyan.

Têkildarî hevdîtinê Çavûşoglû li ser hesabê xwe yê twîtterê daxuyanî da û Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dîsa kir hedef û got: "Em bi nûnerên rewa yên kurdên Sûriyeyê bi heyeta Konseya Neteweya Kurd re civiyan. Me piştgiriya xwe ya ji bo rola wan a di pêvajoya siyasî û Kolîsyona Neteweyî ya Sûriyeyê de diyar kir."

Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê li ser bingehê yekitiya neteweya kurd destûr dabû ku partiyên girêdayî ENKS'ê buroyên xwe vebikin. Partiyên di bin banê ENKS'ê de herî dawî li bajarên Hesekê û Kobanê buroyên xwe vekiribûn.

Fermandarê giştî yê Hêzên Sûriyeya Demokratîk (HSD) Mazlûm Ebdî jî diyar kiribû ku ji bo bicihanîna xebatên yekitiya neteweyî înîsiyatîf wergirtine. Her wiha li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gel nerazîbûn nîşanî serdana ENKS'ê ya Enqereyê da. ***ENQERE***

Bîlançoya vîrûsa koronayê giran dibe

Vîrusa koronayê (2019-nCov) ku ewil li bajarê Wuhan ê Çînê hatibû dîtin, her ku diçe belav dibe. Hejmara welatiyên ku ji ber vîrusê jiyana xwe ji dest didin roj bi roj zêde dibe. Li gor daneyên ku hatin parvekirin zêdetirî 2 hezarî kesan ji ber vîrusê jiyana xwe ji dest daye. Di nav 24 saetan de herî kêm100 kes ji ber vîrusa koronayê mirin.

Herî dawiyê li Îranê jî 3 nexweşên din ên bi vîrusa koronayê hatin tespîtkirin. Bikarhênerên înternetê yê Îranê bi rêya medyaya civakî ragihandin ku nexweşên vîrusê ji ber hilbijartinê nehatine aşkerakirin.

Li gor Wezareta Tenduristiyê ya Îranê li welat sê nexweşên din ên bi vîrusa koronayê ketine hatin tespîtkirin. Bi vî awayî hejmar gihîşt 5 kesan. Hate ragihandin ku 4 ji wan li bajarê Qûmê û yek jî li bajarê Arakê bûn. Du nexweşên li Qûmê mirin.

Wezareta Hundirîn a Iraqê jî bi daxuyaniyek nivîskî ragihand ku dayîna vîzeyê ya ji bo geştiyarên Îranê dane sekinandin. ***TEHRAN***

Xweşkanî

Felemez Ulug

Kurdan dikin qurban

Navbera Tirkiye û Rûsyayê her ku diçe xirabtir dibe. Sedema vê jî pevçûnên li Idlibê û negirtina sozên hatine dayîn in. Dewleta tirk bi tu awayî naxwaze ev herêma stratejîk ji destê xwe berde. Ew jî dizane ku ger giraniya xwe li vê herêmê wenda bike, êdî ne gengaz e ku bikaribe hebûna xwe li vê herêmê bidomîne. Lewma pevçûnên li Idlibê ji bo Tirkiyeyê girîng in.

Lê her çiqas mijar Idlib be jî, di vir de ya girîng berjewendiyên dewletên mezin in, ango dewletên li ser herêmê planên wan hene. Ji ber vê yekê pevçûnên li Idlibê berdewam dikin, bazara li ser herêmê jî germ dikin.

Dewleta tirk baş dizane, ger li herêmê li dijî artêşa Sûriyeyê şer bike, di heman demê de ev tê wateya şerê li dijî artêşa Rûsyayê jî. Di vê rewşê de Enqere jî baş dizane ku wê bi tenê bimîne û ew ê nikaribe bersivê bide van hêzan. Lewma hemû hewildanên Enqereyê ew in ku di vê rewşa aloz de bêyî bi van hêzan re şer bike, pozîsyona xwe ya stratejîk biparêze û hewil bide tawîzan bi dest bixe.

Yek ji planên Enqereyê jî ew e ku li beramberî Idlibê, ji Rûsyayê destûra êrîşî herêmên kurdan werbigire. Ev mijar yek ji mijarên li Moskowê ye û tên nirxandin. Wisa diyar e ku şandeya tirk a çend roj berê hatibû Moskowê ev nêrîn derxistiye pêş. Yek ji mijarên hevdîtinê jî ev bûye. Di vê mijarê de rûs pir sar nêzîk dibin. Lê hebûna planekî bi vî rengî jî dijminatiya dewleta tirk bi awayekî aşkera radixe ber çavan. Ger rûs û tirk di vê mijarê de li hev bikin wê demê pêwîst e komên çete ji herêmê derbikevin. Ev jî tê wateya ku dê herêma Idlibê têkeve bin serweriya hêzên rejîmê. Lê NATO bi tu awayî naxwaze herêma Idlibê bikeve bin serweriya rejîmê. Ev jî tê wateya ku dewleta tirk nikare bi serê xwe li ser herêmê plan ango tifaqan bi pêş bixîne.

Amerîka bi tu awayî naxwaze rejîma Esad hemû axa Sûriyeyê têxe bin kontrola xwe. Bi taybetî jî naxwaze herêmên stratejîk ên mîna Idlibê têkevin bin kontrola rejîmê. Ji ber vê yekê tê gotin, dibe ku rûs û tirk li ser Idlib û bakurê Sûriyeyê li hev bikin. Tirkiye ji Rûsyayê li beramberî Idlibê dixwaze li hin herêmên bakurê Sûriyeyê herêmên tampon çêbike. Lê li Rûsyayê li ser planên cuda jî nirxandinên dike. Li gor van nirxandinan tê gotin ku Amerîka û NATO naxwazin tirk Idlibê radestî Rûsya û rejîmê bike. Di vir de jî Amerîka û NATO li beramberî parastina Idlibê dibe ku destûrê bide da ku dewleta tirk êrîşî axa rojava bike. Yanî hem Rûsya û hem jî Amerîka ji bo berjewendiyên xwe kurdan dikin qurban.

Di nav van hêzan de hemû plan û bazarî tên nîqaşkirin. Ji bo Enqereyê dagirkirina herêmên kurdan pir girîng e û ji bo vê pêk bîne jî amade ye ku bi her kesî re rûnê.

Wisa diyar e ku di vê demê de Moskow bi awayekî hevseng nêzî kurd dibe. Lewma Rûsya dibe ku ji bo Idlibê li şûna herêmên kurdan li Lîbyayê tawîzan bide tirkan. Li beramberî vê jî dibe ku dewleta tirk komên çete yên herî radîkal derbasî Lîbyayê bike.

Dibe ku Erdogan bi tu awayî nêzî van peymana ango van planan nebe û bixwaze hem li Idlibê hem jî li bakurê Sûriyeyê serweriya xwe berdewam bike. Lê em ji bîr nekin ku di halê heyî de niha ji bo Erdogan a herî girîng jî li Idlibê pêşîgirtina artêşa Sûriyeyê ye. Ji bo vê pêşveçûna artêşê bide sekinandin jî amade ye ku tekiliyên xwe yên bi Rûsyayê re xira bike. Mînaka vê ya herî berbiçav jî hatina Erdogan a Ûkraynayê bû.

Em ji bîr nekin ku, di nav dewletên li ser axa Sûriyeyê siyasetê dikin de, ya herî bi hêz Rûsya ye. Ger Rûsya nexwaze ne rejîm ne jî hêzên dagirker nikarin tiştekî bikin. Di vir de rewşa kurdan cuda ye. Kurdan her tim di xeta sêyemîn de israr kir. Lewma ew tu caran nebûn şirîkê dagirkeran û xwe nekirin xulamên wan. Lewma wek bi geşedanên heyî diyar dibe ku ev pêvajo, pêvajoya man û nemanê ye, bi taybetî jî ji bo gelên xwediyên axa Sûriyeyê.

Salnameya gel

Yasemîn Elban

Kurdên gundan, li gor şert û mercên hewayê û li gor tecrûbeyên bav û kalên xwe, ji xwe re salnameyek çêkirine. Bi berf û baranê re, li gor rewşa hewayê salnameyê destpê kiriye û hesabên xwe tev li gor vê salnameyê kirine. Şert û mercên giran ên zivistanê bandoreke mezin li wan kiriye.

Debara gundiyan bêhtir li ser xwedîkirina heywanan bûye. Ji ber ku zivistanê pir dirêj kişandiye, qût û qelatên heywanan, beriya biharê qedyane û derketina heya biharê pir dijwar bûye. Ji ber vê yekê, wan rojên zivistanê jimartine. Li gor wan, zivistan ji kanûnê destpê dike, heya meha çileya paşîn pir bi sar û seqem derbas dibe. Piştî çileyê, îcar hêdî hêdî dinya germ dibe lê gelek caran bi germa hewayê xapiyane û wan heywanên xwe birine zozanan. Lê ji nişka ve, ba û bahoz derketiye û heywanên wan telef bûne û wan jî ji ber vê navek li her bûyerê kiriye û heta roja îro ew nav mane. Wek 'Xaç Xidir Nebî', 'Zîpedar', 'Agirê Filan', 'Sibatê du roj ji adarê deyn kir, gîsk li tehtê wer kir', 'Gamêşqiran'…

Xaç Xidir Nebî

Her sal nîvê meha sibatê, keç û xortên ezep totikên şor dipehtin û ew derengê şevê dixwarin. Di ser de av venedixwarin da ku tî bibin. Piştî diketin xewê, di xewna wan de kê tasek av bida wan, qedera wan bi wî/ê kesî/ê vedibû û bi wî/ê re dizewicîn. Gelek caran keçên ezep ev kar pêk dianî. Car caran xortên malê jî tev li wan dibûn. Dotira rojê di her malekê de xwarina bi navê poxînê dihate pehtin. Piştî ku kifletên malê, xwarina xwe dixwarin keç û xortên gund, bi hev re, her yek ji wan kevçiyek ji xwarina poxînê hildida û dibirin li ser banî, datanîn dora kuleka tenûrê. Dûvre xwe ji wir dûr dikirin û li hêviyê diman dê ka kengî qijikek bê û poxîna wan bixwe. Melûme, zivistanê qijikan qût û qelat neditîn ku bixwin. Giş birçî dibûn. Di demeke kurt de qijik tev dihatin, her yek nikilek li poxînên wan dixist û her yek bi aliyekî ve difiriya. Wê gavê wan, qijika poxîna wan xwaribû dişopand ka gelo dê ber bi kîjan malê ve bifire. Qijik ber bi kîjan malê ve bifiriya, ew kes dibû bûk an jî zavayê wê malê. Hin gotinokên li ser Xaç Xidir Nebî jî wiha ne;

"Xaç Xidir Nebî,
Şîv hebî taştê tunebî,
Wey li wî ku li mala xwe nebî,
Jina wî dibe jinebî,
Orta Xaç Xidir Nebî,
Kî ne li mala xwe bî,
Qesasê serê xwe bî."

Zîpedar (Bûka Baranê)

Li gor salnameya berê, dawiya sibatê keçên gund tev li hev kom dibin û dareke dirêj bi sexevîlekê ve girê didin. Ew dar ji sexevîlekê re dibe wekî du destan. Piştre fîstanekî lê dikin û pûşiyekê diavêjin ser serê wê û wekî bûkekê dixemilînin. Piştre keçên gund bi her du milên bûka derewîn digirin û mal bi mal digerin. Gava diçin ber deriyê malekê, hemû bi hev re dibêjin;

"Zîp zîp e zîpedar e
Sibat here, adar were,
Heke bibare bihar e,
Heke nebare xedar e,
Kebaniya çeng zêrînê,
Here kunca malê,
Ji me re bîne rûnê malê."

Kebanî diçe ji wan re rûn, savar û hêk tîne dide wan, piştre hema zû bi zû satilek av di ser wan de dirijîne. Keçik jî bi ken û bi lez ji wir direvin û diçin maleke din. Malên gund tev seredorî dikin. Dûvre savarê bi navê maşkule dipêjin. Piştî savar dixwin, radibin dikevin milê hev, bi hev re dibêjin û govendê digerînin.

Agirê Filan

27'ê sibatê, mêrên gund tev li qada gund diciviyan. Her yek gurzek dar ji mala xwe dianî. Agirekî geş vêdixistin. Bi saetan li dora vî agirî stranên sivik digotin û govend digerandin. Li gor baweriya wan, wan gunehên xwe diweşandin. Xwarina wê rojê ya taybet jî kiftê tûtiyan bû. Di mala hemû kesan de ev xwarin dihat çêkirin.

'Sibatê du roj ji adarê...'

Tê gotin û li gundekî pîrek hebûye û pênc-şeş gîskên wê hebûne. Bi xelasbûna zivistanê re qûtê gîskên wê qediyaye. Di dawiya sibatê de rojekê tav derdikeve û serma dişkê. Pîrê pê dixape gîskên xwe hildide û dibe zozanan. Germa hewayê lê xweş tê, du roj dimîne û henekên xwe bi meha sibatê dike û dibêje: "Tirt û tirt sibatokê, derketim adarokê min xwarî gangilokê." Li ser vê yekê meha sibatê hêrs dibe û ji nişka ve ba û bahozek radike. Pîrê bi gîskên xwe ve, xwe dispêre bin tehtan. Ba û bahoz, çar şev û çar roj didome lê tiştek bi wan nayê. Meha sibatê lê dinêre ku tiştek bi pîrê û gîskên wê nehatiye. Vê carê meha sibatê ji meha adarê re dibêje;

"Xweha min ê adarê
Bide min du rojên xedarê,
Da ez gîskê ji ser tehtê bînim xwarê."

Sibat ji adarê du rojan deyn dike û şeş şev û şeş roj bager didome. Zor û zerpa xwe heta dawî nîşan dide. Heya ku pîrê û gîskên xwe dimirin.

Gamêşqiran

Li gor rîwayetan wiha tê gotin: Li gundekî, mêrikekî dewlemend hebûye. Çil gamêşên wî hebûne. Di nîvê heyva nîsanê de hewa germ dibe û çêre dide der. Mêrik pê dixape û her çil gamêşên xwe dişîne zozanan. Ji nişka ve ba û bagerek radibe û berfeke pir dibare. Gamêş tev qir dibin. Ji wê rojê pê ve haya xwediyê heywanan bêhtir ji qût û qelatên heywnan çêbûye û ji wê rojê re gotine Gamêşqiran. Ev nav heta roja me ya îro hatiye.

Xewn

*Mem Farqînî**

Amed, gava amedekariya xewê dikir û ewil çû diranê xwe şûşt saet dozdeh û nîvê şevê bû. Beriya ku were têkeve nav livînan wek her carê çû ber paceyê. Pace vekir û li wir çend deqe sekinî. Piştre serê xwe rakir û li asîmanan mêze kir. Di vê navberê de bayekî hênik wek kûçikekî kedîkirî rûyê wî alast. Wek keçikek têgihîştî ramûsanek danî ser lêvan û derbasî hundir bû.

Stêrkên li asîmanê şîn ji alîkî ve dibiriqîn û ji alîkî ve jî bi nazdarî ji Amed re çav dişikandin. Wek pêtên di nav agir de bin disincirîn. Di her kêliya derbasbûyî de çavên wî hînî tariya şevê dibûn. Her ku çavên wî hîn dibûn deryaya stêrkan li ber çavan firehtir dibû.

Ji mehan çile bû. Bi gotina pîrika wî kanûna paşîn. Wisa bû ku hindik mabû çile jî xilas bibe. Lê belê heta aniha carekî jî li gor çileyên salên berê ne berf ne jî baran bariyabû. Û Amed ji ber vê bi têra dilê xwe di bin baranê de negeriyabû. Şilo û pilo nehatibû malê. Wan kuliyên berfê li ber deriyê malê ji ser xwe paqij nekiribû, xemgîn bû. Pîra wî û ew gotinên li ser meha kanûna paşîn an jî çileyê hatin bîra wî. Wek ku di guhên wî de dilorand çavên xwe girt. Ji wana yek dido wisa bûn;

"Kanûn e, ew kanûn e
Berf tê ji asîman e
Qira edeb û însan e"
"Kanûnê ji xwe xeber da
Ez im seqa erdan
Ez maf im li ser çiqas daran"

Çav lê tije bûbûn. Xweziya xwe bi wan rojan anî. Di rastiya xwe de zêdetir di bin barana biharê de digeriya. Ji barana biharê hez dikir. Dibe ku, bi van baranan ax, xweza,, carek din, zindî bibe. Dibe ku sedem tiştek din be. Baş nizanibû. Lê sedem çi dibû bila bibûya cihê biharê li ba wî cuda bû.

Ev nîvê şevê jî gava li asîman mezê dikir bi hêviya dê baran bibare mêze dikir. Lê asîman sayî bû. Çend deqe bi vî awayî sekinî. Di navberê de çiqas dem derbas bûbû nizanibû. Lê gava ferq kir ku ev bayê hênik di nav de derbas dibû û ew ê serma bigire hêdîka paceyên vekirî girt û bi xemgînî ket nav livînên xwe.

Ketibû nav livînan lê xewa wî nedihat. Xwe geh bi vî alî geh jî bi aliyê din ve dizivirand. Dem hat wisa bû ku dil hebû lihêfa li ser xwe biavêje rabe cilên xwe li xwe bike û xwe li kolanan bixe. Lê çawa bû ew bi xwe jî nizanibû. Ji nişka ve zarokatiya wî hatibû bîra wî. Gava demsal bihar bû û baran dibariya gîzmeyên xwe ji piyên xwe derdixistin û pêxwas di nav rezên li jora mala wan de bû, bi vî alî û wî alî de bazdida. Di nav çamûrê de xwe digevizand. Dest ji lotikên xwe bernedida. Lota ku bêhn li xwe diçikand.

Helbet piştî vê dilşadiya xwe ya di bin baranê û di nav çamûrê de derbas kiribû, ji bo viya çi qas lêdan xwaribû ji rehmetiya diya xwe tenê ew û xwedê dizanin. Di vê nîva şevê de dema ev hatin bîra wî bê hemdî çav lê tije bûn. Ev çend sal bûn diya wî rehmet kiribû hê jî dema dihat bîra wî çav lê tije dibûn. Îşev bi taybetî te digot qey ji bo bigirî li hincetan digeriya. Ji dêvla baranê dixwest rondikên çavan birijîne. Lê di dawiya dawîn de ev jî pêk hat; negiriya. Hest di qirika wî de bûbûn girêk û wisa mabûn.

Carna bi xwişkên xwe yên mezin re diçûn nav van rez û zeviyan; xerdel, nanê çûçê, pirpar, tirşok, sîrim, binerdik, tolik, dojnik û gelek cureyên pincarên din kom dikirin. Piştre pincarên kom dikirin dianîn malê. Diya wan jî bi van pel û pincaran gelek xwarinên xweş çêdikirin. Carna di nav rûn de diqeland carna jî dikeland. Dikir nav savar an jî rasterast li ber xwarinek wek şînahî datanî ser sifreya xwarinê. Lê her car ji van pincaran xwarineke cuda û tehmeke niwaze derdixist. Ev cureyên xwarinê pir li xweşa wan bi taybetî jî ya Amed diçû. Dayika xwezayê dida wan û ew jî li ber vê camêriya xwezayê hurmetdar bûn. Te digot qey di navbera wan de peyamek veşarî heye.

Di biharê de dema di bin baranê de digeriya, her dilopek baranê te digot qey giyanê wî dişûşt, wî ji nû ve diafirand. A niha êdî ew xemgîniya wî çûbû, kêfxweşiyek dewsa vê xemgîniyê girtibû. Bi vî awayî, kengî û çawa di xew re çûbû nizanibû.

Lê belê gava bi dengekî xurt û bi gurmegurma birûskan ji xewê şiyar bû, heyirî. Di serî de got qey xewnê dibîne. Lê na ne xewn bû. Deng hê jî dewam dikir. Guhên xwe bel kirin. Deng dengê peşkên baranê bûn. Li paceya girtî dixist. Serê xwe ji ser balgî rakir. Li wî alî mêze kir. Xwest derve bibîne. Lê na, ev ne hêsan bû. Ji bo derve bibîne ji nav livînan derket. Bi çavên nîvxewî ber bi paceyê ve çû û paceya girtî vekir. Ev ne xewn bû. Baran dibariya. Bi vekirina paceyê re peşkên baranê li ser çavan xist, ew şil kir. Lê şilbûn ne xema wî bû, di vê nîvê şevê de.

Bi kêfxweşiyeke bêhempa ji bo qederek li ba paceya vekirî sekinî. Li gengê baranê guhdarî kir. Destê xwe ber bi derva ve dirêj kir. Pêre peşkên baranê ketibûn kefa destên wî. Çend peşkên baranê di nav destan de gihîştibûn hev jî. Piştre vegeriya ket nav livînên xwe. Û bi vê dilaramiyê di xew re çû.

Gava serê sibê ji xew şiyar bû hê jî baran dibariya. Qederek ji nav cihê xwe yê germ derneket. Çavên xwe jî venekir. Tenê dixwest dengê vê barana pîroz guhdarî bike. Li gor berê demeke dirêj di nav cihên xwe de ma û li senfoniya baranê guhdarî kir.

Dawiyê rabû ser xwe. Ji nav livînên germ derket. Çû dest û ser çavên xwe şûştin. Cilê xwe yê rojane li xwe kir. Derî vekir û derket derve kuçeya bi baranê şil bûbû li pêşiya wî dirêj dibû. Di bin vê barana pîroz de ji bo xwe ji nû ve biafirîne, bi her dilopek baranê ji bo giyanê xwe bişo dest bi meşê kir.

Dema dimeşiya destê xwe kir bêrîkên saqoyê xwe. Bi fîqê strana kolanên vî bajarî lê da û meşiya çû…

***Ji girtîgeha Rihayê**

Rîtuelê rojeyê Xizirî dewam keno

Aşma Xizirî bi girewtişê rojeyan û rîtuelanê bawerîye dewam kena. Aşma Xizirî ke semedê elewîyan sey bimbarek yena qebûlkerdene de cem yeno girewtiş û loqme yeno vilakerdiş

Merkezê Xeberan

Elewîtî de zî bawerîya 'Hz. Muhammed pêxembero peynîyo' esta. La welîtîya (îmamî) Hz. Elîyî yena esasgirewtene. Coka ra elewîyan de rêza hûmartişê xelîfeyan cîya ya. Elewîtî de Aşma Xizirî zî esta. Aşma Xizirî de 3 roj roje yeno tepiştene û cem yeno viraştene. Kesê ke rojeyê xo tepişenî qurbananê xo hadre kenê û îbadetê cemî bica anê. No rîtuel verê cû hîna zêde ameyêne caardene. Labelê roja ma ya ewro de hende nîno caardene. No rîtuelo tarîxî û qedîm mîyanê şarî de bîyo sey kultur.

Sebeb û tarîxê no rîtuelî, qasê ke kitabanê bimbarekan de ameyo nuştene wina yo. Wexto ke tofan werizeno, tewrê însanan heme gandarî tersenî û hawarî kenî. Nuh vendeno Homa û vano 'Homa ti vînenê qulê to se kenî. Ti înan bîyar hîdayet.' Dima ra Homa ra wahîyêk yeno û Nuh keştîyêke virazeno. Goreyê bawerîye lajê Nuhî ê bi nameyê Kenan û cinîya ci ke nêwenişenê keştîye tofan de xeniqîyenî.

Yê diyîne zî no yo; Goreyê yewna bawerîye wexto ke tofan hêzê xo xurt keno û bahoz vejîyeno, kesê ke weniştî keştîye hawarî kenî û vanî 'Ya Xizir, ti ma bixelisnî' û duayan kenî. Duayê kesê ke keştîye de bî, hetê Homa ra yenî qebulkerdene. Tofan û bahoz 3 roj û 3 şewe dewam keno û dima ra silametî virazîyeno. No hedîse ra dima her serre aşma sibate de seba Xizirî 3 roj roje yeno tepiştene. Her serre rojeyê Xizirî yeno tepiştene û şar bi duayan Xizirî ra yardim wazeno.

Goreyê bawerîya elewîyanê Anatolî zî di birayê ke mertebeyê pêxemberî de bî, estbî. Nameyê yew Xizir û ê bînî zî Îlyas bî. Nê di birayan ra Xizir rîyê erd de û Îlyas zî derya de şono hawarî û yardimê kesanê muhtacan. Seba ke nê birayî çirra Aw-heyatî ra aw şimitî, ti wext nêmirenî. Goreyê bawerî rîyê erd û derya ser de tena kesê ke na çirre ra aw şimiti nê wirdî bira yî. Goreyê bawerîyan keso/a ke tengî de bo/a û zerrî ra vendo/a înan, ê şonî yardimîya înan.

Na aşma de loqmayî yenê vilakerdene, cayê bimbarekî, cîran û merdimî yenê zîyaretkedene û seba oxirê Xizirî qurban yenî serebirnayene û kesanê feqîran rê yenî vilakerdene. Reyna na aşme de cem yeno giredayene û 3 roj roje yeno tepiştene. Rojeyê Xizirî yo ke nîmê şewe de dest pêkeno û heta şan roje dewam keno. No rîtuelo ke bîyo sey kultur herêma Dêrsimî de hema zî dewam keno. Her çiqas ke goreyê demê verênan zêde nêbo zî rîtuel her serre yeno bimbarekkerdene û vîrardene. Goreyê bawerîyan Homa hetê kesê ke na aşma bimbareke de rojeyê Xizirî tepişenî het de yo û înan her tewir xirabîyan ra paweno.

Wexto ke roje dest pêkeno şar xo şono û kincanê pakan xora dano. Rojeyê aşma Xizirî zî sey rojeyê aşma Remezanî yo û doman, extîyar û nêweşî roje ra muaf tepişîyenî. Na aşme hende ke bimbarek yena hesibnayene şar bi nameyê Xizirî sund waneno, nameyê domanan Xizir roneno û seba Xizirî wexdan (adak) tepişenî. Herême de nameyê xeylê cayan zî bi Xizirî dest pêkeno. Sebebê înan ra yew zî seba cuyayîşê no rîtuelo qedîm û bimbarekî, nameyê Xizirî zaf yeno telafuzkerdene û xebetnayene.

Seke ma cor de zî nuşte, heta nika derheqê Xizirî de xeylê çîyî ameyî vatiş û ameyî nuştiş. Labelê raşte raşt hedîse senî qewîmîya hema zî nîno zanayene. Dêrsim de aşma Xizirî bi rojeyan û rîtuelanê bawerîye dewam kena. Aşma Xizirî de loqmeyî yenê vilakerdene û tirbê bimbarekî yenî zîyaretkerdene. Rojeyê Xizîrî roja sêşeme, çarşeme û pancşemeyê sibate de yenê girewtene û peynîya sibate de qedîyenê. Roje de şar yeno têhet û qala Xizirî keno û cem tepişeno. Sohbetan de hîkayeya Xizirî yena vatene. Wexto ke roje yeno tepiştene paşîve nîna werdene û heta roja bîn ti çîyêk nîno werdene û şimitene.

Badê tepiştişê rojeyî ê 3 rojan xele adir ser de yeno pewtene û goreyê bawerî xeley ke ameyo pewtene areyê kerra de yeno arênayene. Xeleyo ke are de yeno arênayene ganî qasê girdîya îrmîkî bibo. Arênayîşî ra dima xele ya serê potêko pak, ya zî serê temsîyêk de yeno rafînayene. Xele şewêk yeno vindetene. Cinî û camêrdê ciwan ê keyeyî aye şewe nîyet kenî û rakewenî. Serê sibayî wexto ke hewn ra werizenî ewnîyenî serê îrmîkî. Eke serê îrmîkî de şop bibo, yeno bawerkerdene ke Xizir ewja ra derbaz bîyo û dima ra duayan kenî.

Ardê îrmîkî seba werdê şewe yeno pewtene û ronê kele kenî ci mîyan û kenî loqme. Loqme û ardî cîran û merdiman rê yenî vilakerdene. Kesê ke ekonomîya înan baş biba zî qurbanan sere birnenî.

Ziwanê bindestan her proses de yeno qedexekerdene

Nevîn Alkan

21ê Sibate sey Roja Ziwanê Dayîke ya Mîyanneteweyî her serre yena pirozkerdene. UNESCO 1999î de na roje qebul kerd û her serre pêroyê dinya de bi aktîvîte û çalakîyanê cîya-cîyayan û renginan yena pîrozkerdene. Na roje de bale ancîyena serê muhîmîya ziwanê dayîke ser. Kurdî zî serra 2001î ra nata na roje pîroz kenî û bale ancenî heqê perwerdeyî yê ziwanê dayîke ser.

21ê Sibata 1952î de çalakîyanê seba fermîbîyayîşê ziwanê dayîke de polîsêk Pakistanij 11 wendekaranê çalakgeran kişeno. Coka ra Bengladeşijî 21 sibate sey roja ziwanî vîr anî. Her çiqas ke Bengladeşî bi ziwanê Bengalî qisey bikerî zî reyna ziwanê fermî Urdu bî. Bengladeşî na rewşe ra acizbî û nêrazîbîyayîşê xo bi çalakîyan ardî ziwan.

Rewşa Bengladeşî û ya kurdan manena yewbînan. Her çiqas ke pêroyê Kurdistanî kurdan ra pê bêro zî, ziwanê înan yê fermî tirkî, erebî yan zî farisî yo. Hukmatê Pakistanî vera têkoşîn û xoverdayîşanê şarî de mecbur mend ke serra 1956î de ziwanê înan bikero fermî. Tena nika ziwanê kurdanê ke Kurdistan de cuyenî nîno astengkerdene, bi seserran o ziwan yeno asîmîlekerdene û seba ke no ziwan nêro zanayene her tewir çî yeno kerdene.

Her dewlet û sîstem zano ke bingeyê komelî ziwan o. Şarêk bi ziwanê xo û dima ra bi kulturê xo esto û bi înan komel yeno zanayene. Kurdê ke ziwanê xo zanî ya zî qisey kenî, tena bi hewldayîşanê xo no ziwanî musenî, labelê o zî sînordar o. Çimkî cayê ke kurd tede cuyenî de sînorê ke ziwanê xo qisey bikerî ya zî nêkerî ameyî ronayene.

Her çiqas ke destpêkê tarîxî ra nata verê tirkan no welatî de kurdî bibî zî nika kultur, ziwan, muzîk, huner û swb. her çîyê înan rê sînor ameyî ronayene ke no şar ti hetêk de xo aver nêbero, heqêk taleb nêkero û ê timî binê kontrolê înan de bî û vernîya serewedarnayîşan bigêrî.

Tena no proses de nê qirkerdiş û qetilkerdişê seserranê verênan de zî seba çinbîyayîş û vindîbîyayîşê no ziwanî û şarî her tewir polîtîkayê lêşinî ameyî kerdene û hema zî yenî kerdene. Xoverdayîş û têkoşînê kurdan ê seba ziwan, kamî, azadî, yewî û kulturî heta kotî do dewam bikero ma nêzanî, labelê seba cuyayîşê no ziwanê dayîke ke ver bi çinbîyayîşî de yo bicuyo û neslê neweyî qisey bikerî, ganî ziwan her ca de bêro qiseykerdene. Ganî herkes ferqê tarîxê raştî û ameyoxê şarî de bibo. Ameyox eşkeno bêro bedilnayene, labelê vîyarte nîno bedilnayene. Şar eşkeno sibarojê xo virazo û sibarojêk rind domanan rê vera bido. Coka ra qiseykerdiş û perwerde muhîm î.

Keso/a ke ziwanê xo qisey nêkero/, ferqê bîyayîş û çinbîyayîşê şar û ziwanê xo de zî nîyo/a.

Dewey Ma

Cemîl Oguz
cemilo@diyarname.com

Rojava û Başûr butçeyke senîne viraşte?

Ene mesela çiya ra vecîya? Butçeya Almanya ene mesela arde mi vîr.

Di serey 2019'inan de butçeya Almanya 13 mîlyar dolarî zêde vecîya. Welatê zey Tirkîya her sere butçeya cînan nêresena pêser, zirar kenê û her sere deynê înan benê zehf î. La ê Almanya par butçe zêde vecîyawa. Mebûsanê înan aşma (menga) şî hamey têhet, nîqaş kerdê ke ka enî peranê zêdeyan çîya û senî xerc bikerê?

Dinya de vatişê ke est o, "Welotê ke bê mecbûrê teberî bibê, bi derfetanê xo, jiyaney xo dewam kenê."

Ger welatêke de roj, aw û erdê ramitişî bibo, merdimê ê welatî zî bizanê û biwazê bixebetîyê pêdivî ê welatî bi teberî nêmaneno. Ew welat anekî eşkeno serê lingan de bimano. Yê kurdan aw, erd û roj est o.

Di se serey 21'yinan de çîna zî ro enîyan bîyo zêde: Gere melzemey to yê şerî zî bibê.

Almanya par butçeya xo baş viraşte û bi ser de perey kerdî zêdey.

Gelo kurdan ene mesela de se kerd?

Di parçey kurdan estê wirdî zî 'xweser'ê. Jo tera Başûr o. Ewca serey 1992'yinan ra 'xweser' o. Jo bîn zî Rojava wo. Her çiqa bi fermî hetê dinya ra hema niyamew naskerdişî zî mîyanê xo de 'xweser' o.

Pers eno wo:

Başûr de, Rojava de butçey parî çaway bî?

Yînan petrolo rot ra çiqa perey girotî?

Yînan çiqas çî ramitî, çi feyde enî karî ra girot?

Weko bîn çi rot, çi girot?

Çiqa perey xerc kerdî?

Çiqa şî, çiqa dest de mendî?

Yînan butçeya 2020'inan senîn viraşte? Viraşte ya nê?

Di mîyanê ene buçte de çiqa pere qeybî çekan, çiqa qeybî perwerdehî, tenduristî kerdî bare?

Destê ma de agahî zelalî çinîyê. Çiqa hewce keno her kes bizano yan nêzano ez nêzana, la hewce keno merdimê ê parçeyan de nişenê ro, xebate û jiyaney xo dewam kenê bi heme malûmatan/agahîyan bizanê.

Ma reyna bîyarê vîr: Welatê ke xo bi xo eşkenê debarey xo bikerê...

Ger wirdî parçey ma goş bişanê ene joy û beşkê xo bi xo debarey xo bikerê go demo kilm de beşkê serê linganê xo de vinderê. Egir nê, her tebera çîyan bigirî, her paştey xo bidê teber go nê beşkê butçeya xo bivarê, nê beşkê weş serê lingan de bimanê. Nimûney dinya zehfê û ma zî eşkenê dinya ra xo rê nimûnan bigîrê.

Devşirme

Du ciwan li qehweyê rûniştine û li ser kesên devşirme nîqaş dikin. Yekî gundî jî li tenişta wan rûniştiye û li wan guhdarî dike. Lê tu tiştekî ji wan fêm nake. Radibe û diçe ser meseya wan û ji wan re dibêje: Xwarzê niha ji siba xwedê de hûn ji hev çi dixwazin? We qirik li hevdu qetand.

Yê ciwan dibêje: Xalo em li ser kesên devşirme nîqaş dikin.

Yê gundî dibêje: Devşirme çi ye lo?

Ciwan: Ew ê ku li dijî neteweya xwe îxanetê bike, jê re dibêjin devşirme.

Zilam: Netewe, devşirme, bi xwedê min tu tiştekî fêm nekir. De kanê ji min re hinekî vekirî bibêjin ku ez jî fêm bikim lo?

Ciwan: Binihêre xalo, niha ew ê ku hevkariya dijminê xwe bike û li dijî qewmê xwe derê jê re dibêjin devşirme, îca te fêm kir?

Xalo: Ma şîrê kerê vexwarine ku hevkariya dijminê qewmê xwe bikin?

Ciwan: Welehî xalo îca te fêm kiriye, yên ku şîrê kerê vedixwin dibin devşirme.

Xalo: Xwarzê niha ku mirov ji dêvla şîrê kerê, mastê kerê bixwe dîsa dibe devşirme an na?

Ciwan: Belê heman tişt in!

Xalo hêrs dibe û dibêje: De rabin û herin ji xwe re karekî dinê bikin lo. Heke bi mastê kerê mirov bûbûna devşirme, niha ji qereqola gundê me yek leşkerekî jî nemabû ku nebûbû devşirme. Lê ew tiştê ku hûn li ser nîqaş dikin ti eleqeya wî bi şîrê kerê nîn e. Ew tiştê ku hûn li ser nîqaş dikin em bi kurdî jê re dibêjin 'Jê keto û pê keto!'

Riza Uyar

Golikê dadger

Gavanek hebû li gundekî gavanî dikir. Di nav naxirê de goligek şivên û golikek dadger hebû. Rojekê her du golik li rex newalekê li hev didin. Her du bi qiloçan diçin hev. Çawa ku golikê gavan li yê dadger dide golikê dadger di newalê werdibe û dimire.

Gavan zilamekî biaqil û têgihiştî ye. Diçe cem dadger û dibêje hakim beg golikê min û yê te li hev xistin, golikê te li golikê min da û golikê min di newalê werbû û mir.

Dadger dibêje gavan her du jî sewal in tu cirma wan tune ye. Gavan dibêje dadger beg ez mirovekî belengaz im, xizan im di qanûnê de tu tiştekî ku tu bidî min tune ye?

Dadger rûpelên pirtûka pêşiya xwe ya qanûnê li hev dixe û dibêje na gavan tu cezayê xwe tune ye. Gavan dibêje ya rast berevajî tiştê ku min ji te re vegotine. Dadger dibêje çawa?

Gavan dibêje golikê min li yê te xist, golikê te mir. Dadger dibêje bisekine ez careke din li pirtûka qanûnê binihêrim. Gavan dibêje hakim beg tu dizanî. Dadger li pirtûka qanûnê dinihêre û dibêje, gavan ji bo ku ez karmendê (memûr) dewletê me hewce ye tu golikê xwe bidî min. Gavan dibêje çawa? Dadger dibêje qanûn wisa dibêje. Gavanê belengaz nizane çi bibêje, hema di ber xwe de dibêje tu û xwedê. Îca hêjano, qanûnên ereb, tirk, ecem û yên mîna wan ji bo wan e ne ji bo me ne.

Di makezagonên wan de kurd tune ne û mafê kurdan jî tune ye.

Şerif Yilmaz

Balgîfa şêx

Diya Qederê û bavê wê qet li hev nedikirin. Rojekê diya Qederê bi destê keça xwe girt û berê xwe da mala şêxê Zirav. Nav û dengê wî şêxî li herêma wan belav bûbû û çi derdê wan hebûna berê xwe didan mala şêxê Zirav. Qederê hîna 5–6 salî bû û haya wê ji bayê felekê tune bû. Li pey diya xwe dimeşiya û di rê de her daxwaza biskewît û benîştan dikir. Diya wê jî guh nedida daxwazên wê û her ber bi mala şêx ve diçû. Diya Qederê hal û meseleya xwe ji şêx re got û xwest ku wê li ber çavê bavê Qederê şîrîn bike. Şêx jî di nav axaftina xwe de her bala diya Qederê dida ser balgîfê, ji bo pere bixe bin balgîfê ku niviştekê jê re çêbike. Diya Qederê fêm kir û destê xwe avêt paşila xwe pere derxist û kir bin balgîfa Şêx.

Qederê jî li kêleka diya xwe bû. Dema ku çavên wê bi pereyan ket hema hêdîka destê xwe xiste bin balgîfa şêx û bêyî ku haya kesekê jê çêbibe pere ji bin balgîfê derxist. Îca Qedera me piştî ku vegeriyan malê berê xwe da dikanê û li şûna biskewît û benîştekî kartonek biskewît û kartonek benîşt ji xwe re kirîn. Îca bi her sê navê xwedê ew şêxê ku nedît Qederê pereyê wî ji bin balgîfa wî derxist ew ê tu çareyê ji derdê diya Qederê re jî nebîne.

Carekê mirovek din jî çûbû ba wî şêxî û dema ku mêrik derdê xwe jê re digot şêxê me dîsa ketibû derdê pereyên ku dê bixe binê balgîfê. Her cara mêrik çend gotinan dibêje şêx balgîfa xwe nîşan dide û bi îşaretan ji mêrik re dibêje pereyan bixe bin balgîfê. Mêrik jî hema nema tehmûl dike ji nişkan ve diçe derve radihêje mirîşka ku ji şêx re aniye û tîne dixe bin balgîfê.

XAÇEPIRS



JI ÇEPÊ BER BI RASTÊ

1. Hejmarek pir a ji dewaran pêk tê. 3. Teyrekî dirinde ye, pê nêçîr tê kirin. 6. Gotinên nebaş, dijûn. 8. Madeya ji elementek oksîjen û du elementên hîdrojenê pêk tê. 9. Cihê ku tê de agir tê dadan 11. Ajaleke kedîkirî. 12. Erd, herî 13. Ajaleke/î çarpê û li bejahiyê dijî. 16. Şidandina tiştekî, li hev pêçandin. 18. Beşa ji nava mirov heta lingan. 20. Alaveke cotkariyê ye ku didin ser stûyê ga. 21. Li cihekî qeydkirina nivîs an jî agahiyan. 22. Zimanê herêmkî.

JI JOR BER BI JÊR

1. Redkirin, neyînî. 2. Sembola ola îsewiyan. 4. Kesê xwedî agahî û zanîn. 5. Amûreke şer a klasîk e. 7. Bilinkirina tiştekî ji cihê wî. 10. Ajalekî dirinde û hov.14. Pêşgira lêkerçêker. 15. Sûret, resim. 16. Cihê bilind. 17. Kesê hêmin, bêdeng. 18. Rojeke hefteyê. 19. Pêkenîn, biçûkxistin. 21. Ji bendê pembûyî û hiriyê çêdibe.

Bersiva hefteya borî

Karapêtê Xaço û Yêvaya Hagop

Salihê Kevirbirî

Neheqiyeke mezin e ku mirov behsa eşqê ji aşiqan re bike. Li hêla din pirsa herî zehmet ku mirov ji dengbêjekî bike jî li ser eşqê ye. Ji ber vê hindê bi min zor hatibû ku pirsa evîna wî jê bikim. Ez behsa dengbêjê zarokatiya xwe Karapêtê Xaço dikim.

Karapêt her dem dilê xwe ji mêrxasiyan re vekiriye. Di dilê tevahiya mêrxasên ku kilamên wan straye de, evînên ji wan mêrxasan mezintir hebûne. Mêrxas ew kes in, dema behsa eşq û evînê tê kirin, dibin mîna zarokan. Di bin awirên wan ên dijwar de, gelek caran nezerên henûn û nerm veşartine.

Karapetê Xaço, di jiyana xwe ya tije êş û keder de, herdem behsa mêrxasî kirine. Ji kevokên her dema tu gazî wan dikî, xwe diavêjin nav destên te reviyaye, behsa baz û başokan kirine ku dema baskên xwe vedikin reva xezalan di bin siya xwe de dihêlin.

Lê ev dil e, ne tiştekî din! Dema dil ji bo kesekê lê bide tu ba û bahoz nikare bide rawestandin.

Karapêt jî dilek hebûye! Wî dil berdaye Yêvayê. Yêvaya ku jê re dibêje 'Melokê.' Carekê hez kiriye. Ew car bûye cara dawî. Nebûye mîna dildariyên dema me. Ew ne tenê dengbêjekî dema berê bûye, her wiha dildarekî dema berê jî bûye. Yêvaya evîndara wî, piştî xatirê xwe ji vê dinyayê xwest jî, kesê li ser hez nekir. Karapêt heta roja mirina xwe bi demekê jî, li gundê Solxoza Çaran a Eçmîadzîna nêzîkî Yêrevanê her hefte diçe ser gora jina xwe.

Karapêt wiha digot:"Xwezî min mirina Yêvayê nedîta, xwezî nebûma şahidê mirina wê. Xwezî Xwedê pêşî canê min bistanda. Wê jî zehf kişand. Êşên wê, di xetên rûyê wê de xuya dibûn

Yêvaya dayika zarokên wî, yekane şahida barê giran a jiyana wî bixwe ye. Pênç zarokên wan çêdibin. Ji bo her pênç zarokan jî digot, 'Fêkiyên Yêvayê.' Wî badilhewa ev gotin nekiriye. Karapêt, Yêvayê ji asîmanan aniye xwarê. Her dem jê re 'Melek' gotiye. Heq jî kiriye. Her cara ku derdê debarê bi rojên dijwar ên zivistanê re bûye yek jî, Yêvayê hebûn û nebûna mala xwe nîşanê cîran û gundiyan nekiriye. Di demên zor de, dema jin boxçikên xwe didan pişta xwe û berê xwe didan malên bavên xwe, Yêvayê bûye jinexasa li ser mal û zarokên xwe.

Ji ber vê hindê bû her cara ku Karapêt behsa xanima xwe dikir, gotin di qirika wî de asê diman, hêsir diketin çavên wî. Heyfa xwe li wê yekê dianî ku bi çavên serê xwe mirina Yêvayê dîtiye:"Xwezî min mirina Yêvayê nedîta, xwezî nebûma şahidê mirina wê. Xwezî Xwedê pêşî canê min bistanda. Wê jî zehf kişand. Êşên wê, di xetên rûyê wê de xuya dibûn. Ji ber vê yekê min zehf jê hez kir" digot û maweyek di nav bêdengiyeke kûr de wenda dibû.

Yêvaya ji malbata Azîzyan, keça Hagop û Îzmîrê bû. Sala 1936'an, li Qamişloyê bi Karapêt re zewicîbû. Gava dizewicin, Karapêt lejyonerekî artêşa Fransayê ye. Yêvayê sala 1976'an rehma Xwedê dike. Piştî mirina wê, Karapêt careke din nazewice. Fikra zewacê jî nayîne bîra xwe.

Ji pênc zarokên Karapêt, Araksî (1942) li Qamişloyê, Sêrop (1944) li Hisicaya Sûriyeyê çêbûye. Sê zarokên mayî li Ermenistanê çêbûne. Keça wî Araksî ji gundê Solxoza Çaran zewicî ye û li wî gundî dimîne. Sêrop li heman gundî dima, du sal beriya niha rehmet kir. Anahîtê li Kîrovakanê dimîne. Sîranûş li Yêrevanê dimîne. Xatûnê, li Solxoza Çaran dimîne.

Tevahiya zarokên Karapetê Xaço tevî zimanê ermenî, bi kurdî jî dizanin. Lê neviyên wî bes bi ermenî dizanin.

We got nevî?

15 neviyên Apê Karapêt hene.

Xwedê bi rehma xwe şa bike... Amîn!

Reşbelekek bo tenêtiyê

Alik X

Nizanim ez ê çawan dest pê bikim. Dixwazim bibêjim ku li min bibore! Lê weku wê lêborîn, pepûk bimîne. Min divê, jixwe; weku wê ji xeynî peyivîna bi devê bawermendan, awayê din ê vegotinê ne ji dil be. Ji lewre, dixwazim bibêjim ku min bibexşîne! Ji bo ku min bikarîbûya ji te re çong daniyana erdê, qey diviya bû ku zivistana min a 25'an jî di ser min re derbas bûbûya. Te dît, heye ku berî qirnekê, te bi wî mîrî ew name dabû nivîsandin ku tê de digot,"Heta mirov xwe nas dikit, emrê xwe xelas dikit."

Ez ê jî xwe bispêrim hevoka wê nameyê û li xwe negirim. Ez vê gavê, gava ku hewl didim bo te binivîsim jî ne êmin im bê min xwe nas kiriye, yan na. Lê, min tu baş nas kiriyî. Heta berî naskirina te, wateyên min demkî bûn, îcar ez ê hewl bidim ku heman aqûbet neyê serê te. Belkî haya te jê tune be, lê beriya min, helbestkarekî rihspî yê mezin, tu şibandiyî"karxezal"ekê. Bi min, ji ber ku tu êdî ji min re wate yî, şibandinên ji karxezalan ciwantir heq dikî.

Ne ji rûbirûmayîna min a dirêj a bi te re bûya, heye ku min tê dernexista ku ez hîç jî bi dilekî tijî êşiyame; ya ku min berî vê rûbirûmayînê hîs kiribûye, bi tenê acizî, ango, teyisîna birînên demê ya li ser hişmendiya min bûye. Aciziyeke demkurt a ji ber rûbadana ji te, ku li derve, pê bûbûme rizgarkerekî lewçe yî erzan… Lê, ez ê jê şûn ve mastê xwe yê tirşbûyî bi tenê ji te re aşkera bikim. Divê bi tenê tu bi hinek razan bizanibî; da ku tu mîna berê nebî xezeb û bikaribî ji xeynî aciziyeke qelp hîsinên mezin bi min bidî jiyîn.

Gotina dawîn: Dibe ku tu weke sêvekê, simbil an jî rijandina xwînê bi mîtolojiyekê şa nebûbî û dibe ku tu nebûbî têgiheke mirîdhez jî. Lê ez her roj xayîntiyê bi te re dikim û her gava ku pêjna te dikim, pê dihesim ku ji ber reva min a ji te, hîsên min qels û kiryarên min ên din jî qelp dibin… Hasilî, min efû bike tenêtî!

Weswese 2

Jûra xebatê

Şener Ozmen

"A soxîn edebiyat, ji xeratiyê wêdetir çu nîne. Di herduyan de jî hûn bi kerseyeke sext a fena heqîqetê dixebitin."
(G. G. Marquez)

Heqîqeta min jî ev bû: Ji bo ku dewletê di Kaşxaneya Hikûmetê çi jûr û mûr nedabû bavê ji min î karmend re, ew jî rabûbû jûra xwe ya xebatê di xaniyê me yê bi kirê de danîbû ku em xwişk û bira giş di jûrekê de dijiyan, lê ew jûr, ew jûra bi raz û surr –û rûtirş– ku ji xeynî min kesî turuş nedikir (ya rast hingê ez bi van mitaleyan ranêzîkî vê yekê dibûm, lê paşê min têderêxist wekî ne ji ber newêrekiyê ye, nexêr, ne dayik, ne kekê min, ne xwişka min û ne biçûkê malê û ne jî pisîka me poz bi wê jûrê nedikirin loma) ku têkeviyê û ez bi saetan li kel û pelên li ser maseya formîka, yên bi pûtepêdanî hatibûn bi cî kirin, hûr û kûr dibûm û min ew, wekî ku dest bidim tiştine efsûndar, bi hejmekarî dipelandin û diponijîm û hey diponijîm, dîsan jî em hevreşî hev nedibûn, ebeden! Di henga bi rêkûpêkkirina wê jûrê de jî ez li nik bavê xwe bûm, ku bavê min pel û potên xwe yên ku dewletê dabûnê, di nerma xwe de li ser wê maseyê (mezintirîn mobîlyaya di malê de bes ew mase bû) yeko yeko bi keys dikir; cedwela 30 cm, pênûsdank, zimbe, kulker, sûmena reş a jihevketî, xameyên cûrbecûr û rengorengo, pênûstraşên fermî, jêbirên fermî, hibrên fermî, kaxezên fermî, çi yên spî çi yên bi zerî ve…tiştên ku diviya bi tu teherî nehatana dêriskirin, bi tu teherî! Axir, şîret li dayika me dikir beriya terka me bide bi xulekan;"*Çavên te li ser zarokên te bin!"* Çik û çirûsk jê diçûn gava lê dida û diçû em bi tena dayikê dihiştin. Dengê wî di guhên min de olan dida, ew di oxira xwe de diçû, ez jî bi lezebez diçûm diketim jûra wî ya bi raz û surr ku ji wê kêlîkê bi şûn de dibû a min. Dayika min bi pilepil li pey min diket jûrê,"*Kurê min nebî tu destê xwe bidî tiştik û miştikên bavê xwe!"* Tiştik û miştik, tiliya xwe ya eşhedê li ba dikir, erê, erê, min digotê, ez ê destê xwe nedim tiştik û miştikên bavoyî!

Ev pergala nû, awayeke ji awayan rûpişta fermiyetê jî ji ser wan tiştik û miştikan radikir, lewre jûra ku ez lê mezin dibûm û min nivîskar û helbestkarên xwe yên wekî *Lermontov, Rilke, Mayakovski, Andre Gide, Yevtuşenko, Knut Hamsun, Sontag û Celanî* jî mezin dikirin, ne di Kaşxaneya Hikûmetê de bû, her çendî ku nîşaneyên dewletê (wek DMO'yê) li cîyekî yan du cîyên wan kel û pelan hebûya jî, ne yên wê dewletê bûn. Pirtûkên ku min bi tevî wê xizaniyê dikirîn, dem û dest (pirê caran jî teletel) dixwendin û datînan ser wê maseya rûformîka, di navbera cîhana min -cîhaneke min hebû!- û dewletê de dîwareke neban çêkiribû ku ji xeynî min kesî ew nedidît. Dewletê, bi tevî leşker û nokerên xwe, li tengala xênî bû, wîlewîla bêtêlan kizînî li kezeba min dixist, min tiştin dixwendin an tiştin dinivîsandin, demekê bi şûn de şebengên îşkenceyê dihatin ber çavên min û pê re pê re dengê melkemotan citî kaxezên li ser maseyê dibû. Her cara ku min keys lê dianî, peyvek, belkî jî ji peyvekê dirêjtir, min bi tilînivîska ku hevalekî min diyarîyî min kiribû, li nivîsa xwe zêde dikir; *tiq û tiq û tiq û tiq*! Helbesteke Saint-John Perseyî (Ji Bo Pîrozkirina Zaroktiyekê) bûbû pirzika ser zimanê min ya ku digot;"…*ez qala rewşeke derasayî dikim ya wê demê, li nîveka cil û bergan, ya ku di desthilatiya wê de şewq vedide…"* Bi sikûmekî bêrûçik min lambe veditemirand û min di dilê xwe de bi gazindokî digot;"*Lê çima nahêlin ez bixwînim!? Çima nahêlin ez binivîsînim!?"* Çi ku berê şibakeya jûrê ne li dîmenine dilveker bûn, ez ne li Londonê bûm, ne di avahiyeke Georgian de bûm, di jûra min de totem û niviştên ku mêjû û mentiqa tişta ku min dabû pê, bi min bidin peyitandin, nîn bûn ne jî qertpostaleke Proustî ku nivistgehawî rêyî me dida. Li dîwarên jûrê, posterên *Braque û Saul Steinbergî* yên modernîst jî tune bûn, nexêr! Nivîskarî na, lê gelek tiştên ku bi jûranivîskariyê ve girêdayî bûn, ango hûr û mûrên ku xebtûkoşê rengîntir û cîhanê jî berfirehtir dikirin, bi para me neketibû. Em, ne nivîskarên berra bûn, em ne nivîskarên berra ne jî! Wekî ku Kierkegaard jî digot;"*Te divê serfirazî te divê têkçûn bibe dabaşa gilîgotinan, ji bo te her tişt hatiye wendakirin, bêdawîtî êdî te di hundirê xwe de nahewîne, ew te qet nasnekiriye –yan jî jê kambaxtir–, di henga naskirina te de, te mîxî eza xwe, eza bêhêvîtiyê dike!"* Çi dijîm? Çi û çi di bîra min de dimînin wekî min bikin nivîskarekî/e berra? Ji xeynî Fanonî kî heye wekî ez xwe bispêrimê, yê ku dibêje;"*Van garanên bi jimarî yên ku dijîn, van girseyên hîsterîk, van rûçikên ku mirovatî bi para wan neketiye, van zikwerimîyên ku naşibin tiştekî, van lodên reş ên ne serî heye ne binî, van zarokên ku dibê qey ne aydê ti kesî ne, vê debengiya ku di bin tîrêjên tavê de vezeliyaye, vê teqlariwektî ya jiyanê, evana giştik ferhenga mêtingeriyê pêktînin."*

Van bîr û boçûnên bi vî rengî, di henga xwendina çîroka Enwer Karahanî ya bi navê Nivîskarê min de ya ku li ser dilbijandina şêwejîyana nûseran û gilî û gazincên ji vê dilbijokiyê aniye û bi vegotineke ku kêşeya nûseriyê û jûra xebatê –weke gelek tiştan, daw û doza vê yekê jî li mêtingehan dibe kêşeyeke ji kêşeyên afirîneriyê–ji mînakên wê yên rakêşer ên ku bi para me neketine, vediqetîne û hîn ji destpêkê ironîze dike. Ji çira dilê me li nûseriyê spî nabe?"*Ew her dike pitepit ku odeyeke wî tune ye, ew nikare di nav qelebalixiyê de tu karî bike."*(Nivîskarê min, r. 13) *yan jî,"Îcar, ew qas tiştên tîne serê me ne bes e, ew rojê carekê digazine ku odeyeke wî ya xebatê tune ye. Ev çi xebat e? Ma tu êzingan dikî, yan komirê? Tu bîran dikolî, yan menzelan? Ma her teref ne ode ne?"*(r.14), çi ku Karahan –bêguman nivîskarê wî yê ku çep û çûp davêje ber jinê– dizane wekî her teref ode bin jî, bi carekê re kêsvês bikeve derdorê jî, heqîqeta ku Marquêz wê dişibîne kereseyeke sext a li ber destê xeratan, dê veneguhêre. Çi ku dizane di jiyana me ya çol û hol kirî de nûserî, encax bi îroniyê –ya ku li Cîhana Sêyem berdestbar e– berceste dibe û sebaret bi yekê tê axaftin."*Lê ji bo em vê yekê pêk bînin divê ji îroniyê bêpar nemînin…"* dibêje Kierkegaard,"*Çi ku tiştên ku wan ji kok û rehên wê yên ewledar vediqetîne jî her ev e."* Bêjûriya ku di *Nivîskarê min* de bûye sermijarê çîrokê, çav li nivîskarên ku xwediyê xwe jûrekê ne jî diqirpîne, bivê nevê mirov seqaya wan jûran tîne ber çavên xwe, çi ka çawan in, wek; *Serê qelema min sekinî, li ser rûpelê li ber min dirêj bû… Heya wextê çûnê min nivîsand. Ji pozê qelema min, wisa bawer im, hevokên xweşik û qerfik welidîn. Xeta min wek çemekî têr girênek herikî."* (Saturn, R. Alan, r.11), *yan jî,"Dîsa kujê afîşê ji dîwêr vebû. Ji kursiyê ku li ser rûniştibû xwe gal kir, ew bi şûn de ediland. Qelemeke şîn ji xamedanka ser masê girt, di nav destê xwe de bi bir anî. Bi şev, piştî ku nivîsa xwe qedandibû û şandibû, barekî giran ji ser wî rabûbû."* (Defterên Perrîdankan, C. Kulek, r. 29). Ji her du hefteyan, zimanek eşheda xwe tîne. Roja we ya zimanê mader pîroz be!

xwebûn

24 Sibat - 1 Adar 2020 / e-mail: rojname@xwebun.org / Buha: 4 TL Hejmar: 10

İmera Basın Adına İmtiyaz Sahibi: Kadri Esen
Sorumlu Yazışleri Müdürü: İdris Gürmez
Yayın Danışma Kurulu: Abdulla Peşêw
Ehmed Huseynî
Kakşar Oremar
Prof. Knyaz Îbrahîm Mîrzoyev
Selîm Temo
Dr. Zerdeşt Haco

Yönetim Yeri: Kooperatifler Mah. Gevran Cad. Akkoyunlu No: 5/13 *Yenişehir / Diyarbakır*
Baskı: Diyarbakır Yenigün Matbaacılık Selahattin Eyyubi Mah. Turgut Özal Bulvarı, Batıkent Yapı Koop. A/4 Blok Altı *Bağlar / Diyarbakır*

Her nivîskar ji nivîsa xwe berpirsiyar e.

Ji bo abonetiyê
Tel:0 (541) 806 84 85

Ji Hz. Nûh heta Mehmet Tûnç; Cizîr

Keştiya Alalû

Agît Yazar



Rehberê min ê xeybanî, ji êvar ve min plansaziya xwe kiribû ka ez ê çawa li nav Cizîrê bigerim. Li min dibe sibe. Ez ewil diçim ser berber û riya xwe teraş dikim. Edetî nola zavayekî ez xwe ji Cizîrê re dixemilînim.

Ji derbasbûna min a nav Cizîrê û vir ve, dengekî xeybanî di guhê min de dike kurtepist û ji min re dibêje mamo ez te li Cizîrê bigerînim? Deng, pir zêde ciwan e. Gelo ev çi kes e?

Nizanim çima, hema hey sewta Mehmet Tûnç di kûrahiya guhê min de dizinge. Gelo ev ne dengê Mehmet Tûnç be? Ji xwe re di dilê xwe de dibêjim: aha vaye min ji xwe re rehberek dît! Lê dengê tê guhê min, mîna dengê zarokekî ye! Xwe bi xwe ez pirseke din ji xwe dikim: gelo ev dejavû ye? Axir ez xwe bi destê rehberê xwe yê xeybanî re berdidim. Ew bi ku de diçe ez jî ji xwe re didim dû wî.

Keştiya Hz. Nûh û Keştiya Alalû

Çawa pirbûna kulîlkên biharê, mêşa hinguv şerpeze dike ku nizane ka xwe li ser kîjan kulîlkê venijîne û hinguv jê bimêje, çawa teyrê baz bi pirbûna çivîkên di nav refê mezin de şerpeze dibe û dike nake nikane çivîkekê ji wan çivîkan binêçîrîne, aha ez jî wanî bi dewlemendiya dîroka Cizîrê re şerpeze dibim.

Vêca wexta ez biryarê didim ku dest bi nivîsandina lêkolîna xwe bikim, vê niqlê bi dehan peyv xwe di ber hev re dikin û êrîşî qelema min dikin. A qenc ew e ku ez ji keştiya Hz. Nûh destpê bikim. Jixwe navê rûpela min, Keştiya Alalû ye. Alalû, qarekterekî mîtolojîk e.

Rîwayet ev e; Alalû qralekî revoke ye ku ji gerstêrka bi navê Nîbirû li keştiya xwe siwar bûye û 'terkî-Nîbirû' bûye. Piştî rêwîtiyeke bi tirs û xof her wiha xeternak, dinya me kişif dike û tê xwe li vê gerstêrka me ya niwaze a ku nola morîkek şînbirik e datîne. Rawestgeha Alalû ya ewil, dera çemê Dîcle û Firatê ya xwe lê digihîne hev, ew der e.

Xwînerên hêja, piştî Alalû yê min û we vê dinyalika me, vê hêlîna me ya xweşik û şîrînok kişif dike û şûnve, radibe yekê nake dudu qordînata cihê lê di gel peyamekê, ji xwişk û birayên xwe yên li Nîbirû re dişîne û ji wan daxwaz dike ku ew jî werin. Alalû di peyama xwe de dibêje:

"Min gerstêrkek welê muhteşem keşif kiriye ku hemû pêwistiyên me yên jiyanî di xwe de dihewîne. Tişta li Nîbirûyê tine ye jî, li vir heye. Daxwaziya min ji we ev e ku hûn jî qet nesekinin; hûn jî lêxin demlidest werin. Em ê tevdek ji xwe re li vê gerstêrka xaşêlî û nuhî-top ku hîn xwumûm nehatiye ser, pê xenê bibin!"

Piştî peyama Alalûyê, giregirên nişstecihên Nîbirûyê li keştiyên xwe siwar dibin û tên gel Alalû. Radibin ji xwe re tavilkê gundekî bi navê Erîdû ava dikin (Samuel Noah Kramerê navdar ku ew bi xwe lêkolînerê şaristaniya Sûmeran e, dibêje: Peyva Erîdû, tê wateya Herîdûr û roja îro jî ev peyv di kurdî de tê bikaranîn) û bi vî awayî serpêhatiya mirovahiyê destpê dike...

Di derheqa afirandina benîademiyan de, du çavkanî di destê mirovahiyê de hene: yek kitêbên pîroz ên olî; dudu, kevalên kîl ên Sûmeran. Di hemû kitêbên pîroz û her wiha kevalên Sûmeran de, awayê afirandina benîademiyan hema hema tevdek wekî hev in.

Tofan

Piştî benîademî li hev zêde dibin, êdî gewî dibin, di ser xwe re diçin û bêemriya afrînerê xwe ango bêemriya xwedayê xwe dikin. Xweda, ji vê şêla benîademiyan pir hêrs dibe û biryara tofanê li wan rake dide. Li gorî kitêbên pîroz Hz. Cibraîl, li gor kevalên Sûmeran jî serferîşte Enkî ji Hz. Nûh re dibe alîkar, da ku wî û çend heb merivên dilpak ên bawermend ji tofanê xelas bike. Piştî amadekarî temam dibe, hingê destpê dike û dibe giregira ewran, şîrqeşîrqa birûskan û tofana avê radibe; edetî erd û ezman vedireşin. Tofan ew çend tirsnak û bi xof bûye, afirîner jî ango xweda jî ji wê tofana xwe dilerize û diqutufe.

Hasilî kelam, piştî heft roj û heft şevan baran disekine û hêdî hêdî av vedikişe. Paşê keştiya Hz. Nûh xwe li ser çiyayê Gûdî ango çiyayê Cûdî datîne (ji ber ku tîpa 'g' di zimanê erebî de tine ye, di şûna tîpa 'g' de, tîpa 'c' hatiye bikaranîn. Loma jî navê çiyayê Gûdî, wekî çiyayê Cûdî derbasî Qurana pîroz bûye)...

Li gorî kevalên kîl ên Sûmeran nivîsandiye dibêje, çaxa keştiyê xwe li ser çiyayê Nissir (Cûdî) danî, paşê Zîûsûdra/Ûtnamapîştîm (ev her du nav jî ên Hz. Nûh in û tên wateya kesê temendirêj) ji keştiyê derdikeve, spasiya xwedayê xwe dike û xwarineke xweş wekî em bibêjin mewlûdekê di riya xwedayê xwe de datîne. Piştî hingê xweda Anû, her wiha serferîşte Enlîl pê dihese ku Hz. Nûh ji tofanê filitiye. Li ser vê yekê xweda Anû pir hêrs bûye û gotiye:

"Diviyabû temamê benîademiyan helak bibûna! Kî ji benîademiyan re bû alîkar heta hinek ji wan ji tofanê filitîn!?"

Hingê serferîşte Enkî radibe li ser xwe û li xwe mikur tê ku ew ji Hz. Nûh re bûye alîkar û ji tofanê xelas kiriye. Enkî, sedema xelaskirina Hz. Nûh û bawermendên wî wanî tîne ziman:

"Ey Yezdan Anû û serferîşte Enlîl! Heke hinek ji benîademiyan ketibin nav qirêjî û nebaşiyê, ma çi gunehên mirovên nola Hz. Nûh dilpak û bawermendên wî hene ku em qencan û neqencan tevîhev mehû û helak bikin!"

Hingê xweda Anû bi serferîşteyên xwe re civînekê di derheqa Enkî de li dar dixîne. Her çiqas Enkî bêemrî kiribe jî, wî mafdar dibîne û ew tê efûkirin. Her wiha xweda Anû û meclisa wê biryarê distîne ku ji niha pê ve ew ê careke din tofanê raneke, lê ew ê tenê kesên xwurifî, zalim û ji riya xwedayê xwe derketî werin cezakirin.

Serpêhatiya benîademiyan

Piştî av vedikişe, dinya aram dibe. Hingê Hz. Nûh xwe berdide jêr, devê çemê Dîcleyê. Li cihekî, çem dibû du çeq û di navberê de giravek hebû. Derbasî giravê bûn. Bi keviran ji xwe re avahî çêkirin. Avahiya wan, dişibiya keştiya wan a ku ew ji tofanê xelas kiribûn.

Heke baskên wan hebûya, ew ê ji şahiyan bifiriyana. Lewra cara duyem, serpêhatiya benîademiyan destpê dikir. Dinya bûbû gul û gulistan. Ûtû/roj, tîrêjên xwe berdabûn ser erda welatê Dilmûnê/Cizîrê û edetî ew dol dikir. Dayika axa ku ji avê himil geriyabû, çeqê xwe vekiribû, xêr û ber diwelidand.

Bi vî awayî mirovahî li hev zêde bû û nola mêşa hinguv şilê berdan û her bavekî, malbata xwe da dû xwe û berê xwe dan deverek din a dinyalikê. Lê malbata esil a bingehîn qet ji cihê xwe neliviya. Ji wan re digotin gûdî/gûtî.

Xwînerên ezîz! Dor hat êdî em qala welatê Dilmûnê û xwecihên wê gûtiyan bikin. Dilmûn Cizîr e, gûtî jî kurd bi xwe ne. Aha ji heft hezar sal û vir ve ye, ev serpêhatiya wan bi xwe ye. Serpêhatiya dayik û bavê mirovahiyê ye; serpêhatiya kurd û Kurdistanê ye. Kerem bikin!

Keleha Cizîrê

Tê gotin ku cara ewil keleha Cizîrê ji hêla hûriyan ve li ser temelê wê yê berê hatiye zeximkirin. Hûrî, wêrisên gûtiyan in û ew jî pêşiyên pêşiyên kurdan e. Wexta meriv navê çiyayê Gûdî ku di Quranê de wekî Cûdî derbas dibe li ber çavan digire, hingê nola kevirê di kilsê de rûnê, wanî heqîqeta navê pêşiyên kurdan û erdnîgariya wê bi ayetên kitêbên pîroz tên selimandin û li cihê xwe rûdinê.

Piştî hûriyan, em dizanin ku mîtaniyan jî li heman herêmê hikum ajotine û ev şaristanî jî wêrisên hûriyan e.

Piştî mîtanî ji hêla Asûran ve têkdişkên, li bilindahiya Zagrosan bi navê Xalda-Ûrartû, dewleteke serbixwe ava dibe. Ev dewlet jî wêrisên mîtaniyan e û ev deweleta Xalda-Ûrartûyan jî carcaran Cizîrê dixîne nav sînorê hikumdariya xwe.

Bi hilweşîna dewleta Xalda-Ûrartûyan re, vê carê med li herêmê dibin desthilatdar. Heta Med dibin împaratorî. Em baş dizanin ku med jî, wêrisê Xalda-Ûrartûyan e.

Li gor hin lêkolîner dibêjin, di dema me ya nêzîk de ango hezar sal berê, hikûmdariya Merwaniyan jî qismekî keleha Cizîrê restore dikin û hinekî din zexim dikin. Ev jî tê wê wateyê ku Cizîrê ji Merwaniyan re jî malovanî kiriye.

Piştî hilweşîna Merwanî û dewleta Eyûbiyan, vê carê mîrên Cizîrê radibin û derbasî ser textê Cizîra Botan dibin.

Di beşa tê de, rehberê min ê xeybanî min li qesir û qonaxên mîrê mîran, mekanê Melayê Cizîrî, Îsmaîlê Cizîrî, Mem û Zîn û Hz. Nûh digerîne… (***Didome***)